
# Nasîna Rêzimana

## Pirtûka Fêrkirinê




A > < O ? E U I W Y


**Amadekirin**

**Mihemed Ebdo Elî**




Efrîn- 2012.Z – 2624.K

# NASÎNA RÊZMANA KURDÎ

## *Pirtûka Fêrkirinê*

**Amadekirin:**

**Mihemed Ebdo Elî**



**Efrîn... 2012.Z - 2623K**

Amadekarê qabê: Ehmed Ebdalo

Şagirt û xwendevanên berêz... piştî ku çapa yekê ji vê pirtûkê daket nava karê fêrkirinê, em bi kêmasiyên ku tê de hebûn haydar bûn. Wê lomê, me di ev çapa nû de hewilda ku wan kêmasiyan, qaserî ku me pê zanî, çareser bikin. Me mijarin fereh kirin, hinek jî di çapa yekê de ne hati bûn, me daxistin nava çapa nû, nemaze jî di van waran de: Cinav, lêker, veqetandek, tîp û hinek têrmên rêzmanî. Pêwîst e em bêjin, ku em di mijarên rêzmanê de li ser medresa Celadet Bedirxan derin. Spasî ji bo arîkariya mamosteyên zimanê kurdî: Mistefa Henan , Dîlan Elî û Siyamend Birîm...

# Elfebeya kurdî

Peyv û axaftin ji dengan çêdibin, deng jî bi tîpan tên naskirin û nivîsandin.

Elfebeya kurdî ji sî û yek tîpan pêk tê. Her tîpek jî bi du şêweyan tê nivîsandin: Gir, jê re girdek tê gotin. Û Hûr bi hûrek bi nav dibin.

- **Şêweya Girdek**:

A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P
Q R S Ş T U Û V W X Y Z

- **Şêweya Hûrek**:

a b c ç d e ê f g h I î j k l m n o
p q r s ş t u û v w x y z

Tîpên girdek di van rewşan de tên bikaranîn:

1. Tîpa yekê ji **serenavan**(bernavan): Navên ku tenê tiştekî didin nasîn, wek navên: Kesan, bajaran, rojname, miletan, welatan, rojan, mehan, pirtûkan navên xaknîgarî, navên cihên pîroz... û hd.

*__E__z li __E__frînê rûdinim lê hevala min li __D__êrîkê dijî.*

*__L__i sala 1898an mîr __M__iqdad __M__edhet __B__edirxan rojnama __K__urdistan li __Q__ahîrayê derxist.*

2. Tîpa yekê ji destpêka hevokê:

***wek***: ***E****z diçim nav daristanê.*

***T****emen xelas dibe, lê kar xelas nabe.(*Metelok*).*

**3.** Ji bo kurtkirinê:

***Wek:*** Herêma Kurdistanê **(HK)**. Yekîtiya Netewan **(YN).**

## * Denganî di tîpan de:

Tîpên kurdî ji aliyê dengdanê ve, parve du beşan dibin: Dengdar û Dengdêr

**1.** **Tîpên dengdar**, bîst û sisê ne .

B c ç d f g h j k l m n p q r s ş t v w x y z

**2.** **Tîpên dengdêr**, heşt in:

A e ê i î o u û

| **Têbînin giring li ser hin tîpan:** |
|---|
| ***1.*** *Bitevahî, eger tîpên dengdêr '' î , ê'' berî tîpa dengdar '' y '' di bêjeyê de hatin, ew bi tîpa dengdêr ''i'' tên guhertin.* ***Mînak****:* Rov**î** = Rov**iyê** bêbext. *D**ê:** D**iya** min**.*** |
| ***2.*** *Eger du tîpên dengdêr li pey hev hatin, tîpa girêkok ''y'' dikeve navbera wan*: Masî+**ê**= Mas**iyê** reş**.** Ro**nî**: Ron**iyê** jêhatî***.*** |
| *3.Tîpên ''û , u'': Eger li pêş tîpa dengdar ''w'' hatin bi tîpa ''i'' tên guhertin:* ***Dû*** *..* *D**i**wê pixarê..* ***Didu****: Ddid**i**wan.* |

## Rahênan

- Navên van wêneyan li bin binivîsin:







.............................................................................................................







.............................................................................................................

- Elfebeya Kurdî di cihên vala de li rêz sergihayî bike.

... , b ... ... d ... ... f ... h ...
... ... k, l ... n ... p ... r ... ...
t ... ... v ... ... ... z.

- Tîpa destpêkê ya van navdêrên ku xêzik di bin de ne serast binivîse.

<u>azad</u> ................. ji bajarê <u>beyazîdê</u> .......................... ye, ew li ber çiyayê <u>agirî</u>...................... ye û gora Ehmedê

…………………… li wir e. Wî di kovara pirsê …………………… de helbest ……………………… kurdî û gotar …………………… xwendin.

- Navine ku bi dengdarekê dest pê dikin binivîse.

………………… ……………… ……………… ………………… ……………. ……………… … ………………

- Şêweya rast a van navdêran di cihên vala de binivîse: *(netewan, şêrînê, ferhêd, newroz, rojhilata navîn).*

………… silav da …………….. . Ew bi hev re di rojnameyeke bi navê ………………. dinivîsin. Gotara wan vê carê li ser rola Encumena Mafê Mirovan ya Yekîtiya ……………… di dewletên ……………………………… de ye.

- Navên ku xêzik di bin de ne bi şêweya kurtkirî binivîse:

Li sala 612an berî zayînê gelê Med bû dewlet…………………………………………. .

Saziya fêrkirin û parastina zimanê Kurdî şagirtan fêr dike……………………………………………………………………. .

# CELADET BEDIRXAN
## Hîmdarê Elfebeya Latînî ya Kurdî*

Dema Mîr Celadet Bedirxan li Istenbûlê şagirtê dibistanê bû, pirsa Elfebeya Kurdî ew dikişand. Ji ber ku wî didît Elfebeya Erebî-Osmanî dengina dide, di xwendinê de netên nivîsandin, ev jî ji zimanê Kurdî re pirsgirêkek mezin bû.

Mîr Celadet li sala 1919an bi Mêcer E. Noel re diçû Kurdistanê. E.Noel xwe hînî Kurmancî dikir, Celadet jî kelepûra Kurdî ya devkî kom dikir. Lê gava ew li tiştên ku dinivîsandin vedigerîn, Celadet didît, Noelê ku bi Latînî dinivîsî, bê dijwarî dixwîne, lê Celadet bi dijwarî destnivîsên ku bi tîpên Osmanî nivîsî bûn dixwîne. Bersiva vê pirsê diyar bû; pirsgirêk di tîpan de bû, C.Bedirxan dibêje: ((*Wê hîngê min*

* Bi kurtahî ji pirtûka: ((Raperîna çanda Kurdî di kovara Hawarê de))- Dr. HUSÊN HEBEŞ.

*di cih de qirara xwe da, û ji xwe re bi herfên Latînî elfebeyek pêk anî* )).

Gava C. Bedirxan vedigere Istenbûlê, Elfebeke ji 36 tîpan datîne û pê pirtûkekê dinivîse, lê mixabin, destlata Tirkiyê wan dibe û Mîr Celadet jî sirgûn dike.

Paşê, Mîr Celadet li Şamê elfebeke ji (31) tîpên latînî danî, û kovara ''Hawarê'' li sala 1932an pê derdixe.

Gava Mîr C.Bedirxan elfebêya Kurdî ya nû datanî, wî digot: YEKÎTIYA MILETÊ KURD BI YEKÎTIYA ZIMANÊ KURDÎ PÊK TÊ. DI YEKÎTIYA ZIMÊN DE JÎ GAVA PÊŞÎN YEKÎTIYA TÎPAN E.

# Kît

Kît, bêjeyek e, yan beşek e ji bêjeyê. Ttîpeke dengdêr bi serê xwe jî kîtek e. Di her kîtekê de tenê tîpeke dengdêr heye.

***Nimûne:***

**1. Kît Tîpeke dengdêr** e: î.. a.. ê..i.. û.. o.... her tîpek ji van kîtek e.

**2. Kît beşek e ji bêjeyê**: Hev+car (hevcar).. ko+me+le (komele)..pir+tûk+xa+ne (pirtûkxane).. ser+ bes+ tî (serbestî)....

**3. Kît bêjeyek**e temem e: av, dev, dar, dest, das, sîng, lo..

*Ev zebeşa çend kakil(kît) in?*



…………………………………………………………….

*Şora ''zebeş'' çend kît in?*

…………………………………………………………

# Bêje

Bêje, peyveke serbixwe ye, kardayîn û wateyekê dide.

***Wek**: Zinar, li, ez, azadî, rûgeş, lêhatin, dengbêj, evîndarî, tembûrvan, birî, kirî, hilhat, daket, jihevketin...*

Ji aliyê binyata bêjeyan ve, bi gelmperî, çar cureyên bêjeyan hene: Sade, pêkhatî, hevedidanî û bargiranî.

## 1. Bêjeya sade:

Ji bêjeke sade pêk tê.

***Wek**: Nan, rût, penêr, ket, sar, birûsk, ...*

Kîtên bêjeya sade bi tena xwe bê wate ne.

## 2. Bêjeya pêkhatî:

Ji bêjeyeke sade û pêrkît (pêşkît) yan parkîtekê(paşkît) pêk tê. Bi tevahî pêrkît û parkît bi serê xwe bê wate ne.

- **Bi alîkariya pêrkîtan**:

***Nimûne**: **Vê**keti*n*, **ve**nûştin, **hil**ketin, **bê**bext, **ra**bûn,...*

Gelek pêrkît di zimanê kurdî de hene, ev in çend ji wan:

( vê, ve, hil, bê, ra, rê, , bi, ...)

**- Bi alîkariya parkîtan:**

***Wek***: Şer**van**, çek**dar**, çay**dan**, kesk**e**, lez**ok**, kin**ik**, bende**war**.*

Gelek parkît di zimanê kurdî de hene jê: (Van, dar, e, war, dan, ik, ok, ker, kar, ek, mend, yar, ber).



Berçavk

## 3. Bêjeyên hevedidanî:

Ew ji pevgirêdana du bêjeyên sade pêk tê.

***Nimûne***:

*Sersal (Ser-sal), sorgul (sor-gul), rojbûn (roj-bûn), nalenal, rasterast, ardû, Kêrguh...*



Marmasî

## 4. Bêjeya bargiranî:

Ji pevgirêdana bêtirî du bêjeyan pêk tê.

***Nimûne***:

*Lihevxistin: **Li**(daçek) + **hev**(cinav) +* **xistin**(lêker).

*Bidarvekirin: **Bi**(daçek)+ **dar**(nav)+**ve**(paşdaçek)+ **kirin** (lêker).*



Kêrguh (kerguh)

> *******Wek em dibînin, pêrkît û parkît rêkê ji pêşdeçûn, nûjenkirin û dewlemendkirina zimanê Kurdî re vedikin.*

## Rahênan

- Van bêjeyan kît bike û li ber binivîse:

Rengîn……………………, roj…………., armanc…………………, ronahî………………………, kurdistan…………………………, hişmendî……………………, siyaset……………………., û……., yan…….., beyazîd…………………, laleş………………., rû……… .

- Kîtek bi tena serê xwe di bêjeyê de bê wate ye. Van kîtan li hev wîne, bike bêje û li ber binivîse:

Van- aş……………., dî-za-a……………………., reş-şo. ………………., dan-ser-hil………………., war-ha……………., din- çûn………………., pê- xwe- dan-şan………………………., hev-tin-li-ha………………… lat-we………………………., zû-man-sa…………………………….. .

- Cureyên van bêjeyan ji aliyê binesaziya wan de li ber binivîse:

Aldar……..........., Binavkirin……….............., Welat……….........., Paşeroj….................., Berçavik…………....., Nêçîrvan……………., çû………….., Bindestî…….............., rastî.......................... .

- Du bêjeyên sade di hevokan de bi cih bike:

…………………………………………………………….

…………………………………………………………….

- Du bêjeyên pêkhatî têxe hevokan:

…………………………………………………………….

…………………………………………………………….

- Du bêjeyên hevedidanî di hevokan de bi cih bike:

…………………………………………………………….

…………………………………………………………….

- Du bêjeyên bargiranî têxe du hevokan:

…………………………………………………………….

## Ziman û Hînkirina Ziman*

**Cegerxwîn**

Vejîne zimanê xwe ey xwendevan
Nebûye milet hîç kesek bê ziman
    Zimanê me xweş xeroş û ciwan
    Eger baş bizanî tu nakî ziyan
Tu Kurmanciya xwe ji bîr nekî
Eger baş nizanî divê zêdekî
    Elîfba û dîwan û ristan bixwîne
    Heta ku wekî min nebî dil bi xwîn
Binêr zimanê te çend dewlemend
Li bajêr, carek xwe bighêne gund
    Bihêne(nas bike) çi şêrîne ev reng ziman
    Çi payebilind û rûmetgiran
Bi pirsên xwe nazik, bi dengan sivik
Ne pirsek biyanî be nabe girik
    Tu paqij ke zarê xwe şêrîn bike
    Bi Kurdî tu baxêv û qêrîn bike
Tu binivîse, çêke hezaran nivişt
Nivîsxan, li herder ji wan bibine mişt
    Wî bighêne rêza zimanên mezin
    Bi nosîn û ristin, bi kêş û wezin
Xwe parast ji dijmin wekî pehlewan
Gelek afirandin wî pirsên ciwan
    Heger lê xuya ne hinek toz û jeng
    Ne gunehê wî ye, em şiyar bûn dereng.

---

* Ji dîwana "Zend-avêsta" rûpel "79-80", 1981.

# Navdêr

Her tiştek bi **navekî** tê nasîn. Di warê rêzmanî de, ji navên tişt, mirov, lawir û ramanan re **navdêr** tê gotin.

dar roj baran berf av
gul lawir mirov çiya
balinde geya çem ax kanî awaz
stran... xemla welatê me Kurdistan in

## Bîna û nebînahiya navdêran

- **Bîna û nebîna**(binavkirin û nebinavkirinê) **di navdêran de:**

Di kurmancî navên xweser bîna ne, wek: Mirov, dar, raman... Lê gava alava nebînayê bi navdêr dikeve, wê dike nebîna, ew alav jî ev in:

**Ek** : Ji yekejmara her du zayendan re.

*Xort**ek** , Keç**ek***

**In** : Ji gelejmara her du zayendan re.

*Xort**in** , keç**in.***

# Veqetandek

**Veqetandek:** Alav-bêje ne, dikevin paşiya navdêrê û wê ji wekhevên wê vediqetîne û dide nasîn û têkliya di navbera navdêrê û bêjeya li paş wê (rengdêr, cinav, navdêr) dide nasîn.

Li gor rewşa navdêrê veqetandek bi du şêweyan tên:

## A. Veqetandekên navdêra binavkirî.

***Nimûne:***

**Hesp**(nêrza):<u>Yekejmar</u> <u>Gelejmar</u>



*Hesp**ê** sipî.* *Hesp**ên** mor.*

Di van nimûneyan de bi veqetandekê, hespê sipî û yên mor ji nav hespan hatine veqetandin û nasandin, û hejmar û zayenda wan jî hatine naskirin.

Veqetandekên navdêrên binavkirî ev in:

- **ê**: Ji bo yekejmara nêrza.

**Mînak:** *Karmend**ê** zîrek.* *Heval**ê** te.* *Ew**ê** biyanî.*

- **a**: Ji bo yekejmara mêza.

***Nimûne:*** *Karmend**a** zîrek. Heval**a** te. Ew**a** biyanî.*

- **ên**: ji bo gelejmariya her du zayendan.

**Nimûne:** Karmend**ên** zîrek. Heval**ên** te. Ew**ên** biyanî.

***** *Eger tîpa dawiya navdêrê dengdêr be, tîpa ''y'' ya girêkok dikeve navbera wê û veqetandekê**:*** Rû: Rûyê sipî..

## B. Veqetandeka navdêra nebinavkirî.

Ew bi du teşeyan tê:

- **î**: Ji bo yekejmara zayenda nêrza.

***Nimûne***:

*Kurek**î** malê. Barek**î** giran.*

- **e**: Ji bo yekejmara mêza û gelejmara her du zayendan.

***Nimûne:***

*Darek**e** sêvê. Stranbêjek**e** dengxweş.*

*Jinine nenas û mêrin**e** biyanî li mûzexaneyê bûn.*

Ango mirovên nenas li mûzexaneyê pir bûn, lê em ji nav wan mirovên nenas, hinekan vediqetînin û çêrê dikin.

**Rahênan**

- Bêjeya yekê bi veqetandeka navdêra bîna(binavkirî) sergihayî bike:

Text... hişk. Ba ..... hêgin. Masî ... reş.

Mobayil ... nûjen. Hêv ... gulover. Zarok... biçûk.

- Cihên vala bi van bêjeyan dagire, û xêzekê li bin veqetandekê dîne:

(**keçik, welat, mal, çiya, ba**)

......... azadiyê rabû. ......... Kurdan ên bilind.

......... me jîr in. ......... me ne azad e.

......... gur e, ne ard e ne bulxur e.

- Sê hevokan li ser van veqetandekan binivîse:

Î: ...........................................................................................................

e: ...........................................................................................................

ên: ...........................................................................................................

- Cihên vala bi parkîtên lêhatî dagire:


Pisîk...... me heye, ....... çêlik kirin, çêlik...... şîrê diya xwe mêtin ta mezin bûn. Çêlika sibehîtir xwişka min jê hez dikir û ji xwe re hîşt, ya din jî kurekî cîran...... me heye, wî bir mala xwe.

- Van bêjeyan di cihên vala yên lêhatî de bi cih bike, (keçek, xortek, hevalin)

Min li ser Fêsbûkê..................... ji Îranê nas kir, pişt re min ................. ji Tirkiyê û ....................... ji Hewlêrê jî nas kirin, di gel ku me hemiyan hîn hevdu ne dîtiye, û em hevdu nas nakin, lê em bûne havaline îjdil.

- **Mijar**: Cîranên we rind in, çima ew bi rindiyê tên nasîn? Çend xêzikan li ser rindiya wan binivîse.

# Seydayê CEGERXWÎN[*]



Cegerxwîn

Navê Cegerxwîn, Şêxmûs kurê Hesen e. Ew di sala 1903an de li gundê Hesarê ku bi ser Mêrdînê ve ye ji dayîk bûye. Wî zarotî û berxortaniya xwe di belengazî û perîşaniyê de borand. Wî di hevdeh saliyê de dest bi xwendina olî kir, şehadeta (Îlmê şerî’etê) stand û ket rêza feqehan.

Li wan deman, tevgera serxwebûnê di nav Kurdistanê de dest pê kiri bû. Lê mixabin şoreşa Şêx Seîd têkçû, ew bi xwe jî dîl bû û hat bidarxistin, û gelê Kurd jî şerpeze bû.

Li dema xwendinê, Cegerxwîn bi feqetî li Kurdistana Îraqê û Îranê geriya bû. Vê gerê di canê Seyda de şopeke çak û ronak hîşti bû, û

---

[1]. Amadekirin Mihemed .E. Elî, ji deqeke Osman Sebrî.

derdê miletê ku di nezanî û bêtifaqiyê de dîl û bindest ma bû bibîr dibir.

Di wan rewşên dijwar de, xîreta Seyda qebûl ne kir ku di nav refê oldaran de bimîne, rabû cibe û şaşik avêtin, û daket qada xebata welêt.

Rola helbest û xebata Cegerxwîn, di hişyarbûna Kurdan de pir mezin û hêja bû. Ticarî ew ji tevgera azadîxwaz a gelê Kurd bi dûr ne ket, Ji ber wê jî zor, zîndan û dûrkirin jî dît. Cegerxwîn dora pêncî berhemên nivîskî, di gelek warên nivîsê de li şûna xwe hîştin, bi taybetî jî di warê helbest û wêjeyê de.

Helbestvanê bi navûdeng Cegerxwîn, li sala 1979an çû welatê Siwêdê, û li 22.10.1984an çû ser qedera xwe, û li bajarê Qamîşlo hat veşartin. Hersal li roja goçkirina wî, mehrecana helbesta Kurdî li Sûryê tê lidarxistin.

# Tewandina Navdêran

Tewandin rewşeke kesandina navdêrê ye. Di tewandinê de, navdêra binavkirî(bîna) û nebinavkirî(nebîna) li gor zayend û mêjera xwe parkîtên tewangê werdigirin.

1. **Tewandina navdêra binavkirî**:

Navdêra binavkirî bi hatina alavên (ê, î, an) li paşiya navdêrê tê tewandin:

- **ê**: Ji bo yekejmara mêza.

***Mînak:***

*- Hêv**ê** derdor ronî kir. - Hoste alav**ê** durust dike.*

- **î**: ji bo yekejmara nêrza.

***Mînak:***

*- Ferhad**î** ji Şêrînê hez kir. - Pêşengî rê vekir.*

- Lê belê eger tîpên " a " û ''e'' di navdêra nêrza de hebin, rê heye, ku tewandina wê bi guhartina wan tîpan bi tîpa " ê " pêk were.

***Nimûne***:

| | | | |
|---|---|---|---|
| *Baj**a**r* | ⟹ | *Baj**ê**r...* | *Narîn çû baj**ê**r.* |
| *B**a**xçe* | ⟹ | *B**ê**xçe...* | *Li b**ê**xçe meywe hene.* |
| *K**e**vir* | ⟹ | *K**ê**vir...* | *K**ê**vir ji ser rêkê rake.* |

**- an**: ji bo gelejmara her du zeyandan.

***Mînak:*** *- Hevalino! dost**an** pir bikin. - Karkir**an** maf xwastin.*

**2. Tewandina navdêra nebîna**:

Navdêra binavkirî bi hatina alavên (ê, î, a) li paşiya wê tê tewandin:

**ê**: Ji bo zayenda yekejmara mêza. Ango (ê) lê zêde dibe.

***Nimûne:***

*Gulek: Gulek**ê** bîn dikim. Mûmek: Mûmek**ê** vêdixim.*

**Î**: Ji bo yekejmara nêrza. Ango (î) lê zêde dibe.

***Mînak:*** *Ez marek**î** dibînim. Ez dilek**î** şa dikim.*

**a**: Ji bo gelejmariya her du zayendan.

***Mînak:*** *Zarokin*:*Rûmet bi zarokin**a** re dilîze.*
*Hevalin:Hevalin**a** ew bi xwe re bir.*

**3. Kengî navdêr tê tewandin:**

Navdêr di van rewşan de tê tewandin:

**a-** Eger navdêr Kirarê lêkera têper(gerguhêz) be di dema borî de tê tewandin.

***Nimûne***: *Azad**î**/Az**ê**d helbestek xwend.*
*Sozîn**ê** gul beref kirin.*
*Zarok**an** darek çand.*

**b**- Eger navdêr biresera (durust û ne durust) be di hemû demên lêkerê yên din de.

***Wek***: *Ronahî lîstok**ê** dixwaze?. Ew gûz**ê** bi k**ê**vir dişkîne.*

*Zarok bi lîstok**an** dilîzin.*

**c-** Dema ku navdêr biresera navdêreke din be.

***Wek**: Axa welê**t**. Beyarê Leylan**ê**. Vejîna hêviy**an**.*

## Rahênan

- Navdêrên ku xêzek di bin de ye bi awayên tewandî binivîse:

Diya min xwarin………………çêdike.

Azad ………………………………. stran gotin.

Tu wî goşt ……………………… bikelîne!

Em ji zarok …………………… hez dikin.

Rojîn ………………………………. fîstan kirî.

- Navdêrên jêrîn wek biresera lêkerê di dema niha de têxe hevokan:

Sol: ………………………………………………………

Welat: ………………………………………………………

Gul: ………………………………………………………

- Ev navdêrên nebinavkirî di rewşa tewandî de têxe hevokan:

Destek:

…………………………………………………………………………………………………

Malek:

…………………………………………………………………………………………………

Penaberin:

…………………………………………………………………………………………………

# Zaravên Zimanê kurdî*


Şakir Xesbak

Piraniya zimanzanan li hev kirine, ku zimanê kurdî ji binyata xwe de zimanekî Hindo-Eurupî, û ji koma zimanê Bakur rojavaya Êranê ye, û ew zimanekî serbixwe ye.

Bi tevahî, lêkolînvan zimanê kurdî parve du zaraveyên sereke dikin; zarava bakur û zarava başûr. Zaraveya bakur li ba kurdên li bakur û rojavaya Gola Urmiyê, Kurdên Komara Ermenistanê, Kurdên Tirkiyê, Kurdên Sûryê û Kurdên Badînanê ve bi kar tê. Zaraveya başûr jî kurdên van navçan pê deng dikin: Kurdên Soran li herêma Erbîlê, Kurdên Baban li Silêmaniyê û Kerkûkê û

*Dr. Şakir xaspak- pirtûka El Ekrad, rûpel 482- çapxana Şefîq- Bexdad 1972- bi zimanê Erebî... wergerandina Kurdî: Mihemed.E.Elî.

Kurdên Mukrî û Erdelanê li Kurdistana Êranê.

Zaraveya bakur ku bi zarava Kurmancî tê naskirin, li ser hev e û binezarên wê tunene. Pergalên wê  jî cuda û diyar in, û belkî ew zarava kevintir be jî. Zarava başûrî ku bi zarava Kurdî tê binavkirin, binezarên wê hene, yên berztir binezarê Mokrî (Mokrî-Soranî) û binezarê Silêmaniyê (Silêmanî-Erdelanî) ne.

Ji bilî wan zaravan, zaraveke din li ba Kurdên Tirkiyê heye, jê re (Zaza) tê gotin, ew li herêma di navbera Diyarbekrê û Erzincanê de tê bikaranîn. Zaravekî din jî li Êraqê û Êranê heye,  jê re (zarava Goranî) tê gotin. Ev zarave li ba hozên Hewramî û Kakayî li Kerkûkê û hozên Baclan li nêzîk Xaneqînê û hozên Goranî li Êranê tê xebtandin.

# Mêjera û zayenda navdêran

## • Mêjera navdêran:


Gelek

Di zimanê Kurdî de du mêjer hene, yekejmar û gelejmar. Mêjera navdêrê bi du şêweyan tê nasîn:

**1.** Bi anîna hejmarê li pêş navdêrê.

***Wek***: *Yek dest, çar perçe, neh makîne... HWD.*



**2.** Bi alîkariya parkîtên nebinavkirinê li paşiya navdêrê:

### a- Ji bo yekejmariyê:

Yekejmariya navdêrê, bi alîkariya parkîta yekejmariyê ''**ek**'' çê dibe.

**Wek**: Dar**ek**, keç**ek**, kur**ek**, heval**ek**... .


Yek

### b- Ji bo gelejmariyê:

gelejmariya navdêrê, bi alîkariya parkîta yekejmariyê ''**in**'' çê dibe.

**Wek**: Dar**in**, keç**in**, kur**in**, heval**in**... .

**c- Bi riya alavên tewang û veqetandekê**: (Li waneyên tewang û veqetandekê vegerin).


Destek

## • Zayenada navdêran:

Bi tevahî, du zayendên navdêran hene, nêr **''Nêrza''** û mê **''Mêza''.** Zayenda navdêran bi rêya parkîtên tewang û veqetandekê tê nasîn. (Li waneyên tewang û veqetandekê vegere).

Lê li ba Kurmancan- li gel hin awartan- zayendên heyînan wiha hatine nasîn:

**1-Nêrza:** Navdêrên nêrza wek:

- Giyanewerên nêr: Mêr, kewnêr..
- Endamên laşê giyaneweran ên derve: Dest, zik..
- Tiştên negiyanewer yên beloq û bilind: Çiya, kevir..
- Berhemên lawiran: Şîr, goşt ,mast,penêr...
- Ezman û ba.
- Navên hesinan û rengan: Zer, baqir..
- Çekên lixwekirinê: Kurk, şelwer..
- Darên hişk û birî: Text, çov..


**2-Mêza:** Navdêrên mêza wek:

- Giyanewerên mê: Jin, marî..
- Tiştên kolandî, qul û dûz: Şikeft, deşt..
- Bêjeyên raderî: Anîn, serkeftin ,xwendin..
- Rêxistin û sazî: Komele, partî ,sazî ..
- Alavên navgîniyê: Makîne, telefûn..
- Serenavên xaknîgarî: Afrîkqa, Rojava..
- Tiştên ku li ezmên in, yan tiştên ku ji ezmên tên: Stêrk, ronak..
- Yên ku navên çaxê dinimûnin: Kat, werdek, meh..
- Nexweşî û birîn: Wêran, pençeşêr..
- Şîv, xwarinên kelandî, û navên firaxên xwarinê: Kolik, biroş..

- Alavên mûzîkê û tiştên nivîsandinê: Pênûs, tembûr..
- Bêjeyên razber yên pêkhatî: Jêhatî, hişmendî..
- Bi gelemperî, bêjeyên ku mîna navdêran bi kar tên û em nikanin bi şêweyekî xwezayî zayenda wan nas bikin, wek: Navên tîpan, hoker, cinav...

## Rahênan

- Navên van wêneyan li gel salixeke wê li bin binivîse:





..........................................................................................................................





.........................................................................................................

- Çend navdêran li cihên vala binivîse:

.................. .................. .................... .................
.................. .................. .................... .................

- Gelek cureyên peyvan hene: Navdêr, rengdêr, lêker, cinav û hwd, bêjeyên navdêr xêzekê di bin re bikşîne.

Sor mal hat ew keç ma dem
av merx çû çiya azadî zik koletî raman.

- Navên du bajar, du hunermend û du nivîskarên Kurd binivîse:

.................................................................................................................................

.............................................................................................................................

- Ji bo her zayendekê sê nimûnan wîne û yekê têxe hevokekê:

Mêza: ........................ ............................. ................................

.............................................................................................................................

Nêrza: : ........................ ............................. ................................

.............................................................................................................................

- Navên van wêneyan binivîse û zayenda wan xuya bike:







.............................................................................................................................



**- Mijar:**

Tu çi di vê wêneyê de dibînî bi nivîskî salix bide.

............................................................

............................................................

# LEHÎ *



Celadet Bedirxan

Tifaq û yekbûn, zexmî û xurtiya civatê ye. Nifaq û berberî qelsî û jarîya wê ye.

Di vê cihanê de her tişt her mezinahî bi tifaq û yekbûnê, bi dayîna hev ber barên hev, bi hevgihana mirov û bi hevgihandina xebatên wan hatine pê.

Milet û dewlet bi tifaqê gihane bilindiya her tişt û bi nîfaqê ketine biniya kortala neyînê.

Ji lewre mirov dikare bêje, heyîn di tîfaqê de, neyîn di nîfaqê de ye. Xurt û zexmiya yekbûnê di lehîyê de gelek qenc têt dîtin.

Ma lehî çî ye ?

Lehî ji hevgihana dilopên baranê pêve ne tu tişt e. Peşkên baranê gava ji hev cuda û yek bi yek dikevin rûyê erdî, erd wan dadiqurtîne, tîbûna xwe

* Kovara Hawar- hejmar 2- rûpel 13/ sal 1932...

pê vedikujîne. Lê gava digehên hev, hingî ji wan peşkên qels lehîke mezin radibe. Dilop û peşkên baranê bi yekbûnê di tifaqê de ne.

Erdê dilopxwar hêdî di destên wan de lehîstokek e. Ew serdestên erdî ne. Bi erdê re dileyizin; sînga wî qul dikin, bilindiyên wî hildiweşînin, kendalên wî diqelişînin.

Lehî wek hûtekî har û hêç radibe ser xwe, ji pal û kaş û newalan dadikeve. Li ber wê tu kes, tu tişt; bican, bêcan nema dikare bisekine. Lat, zinar, kevir, rêl, dar, direh serên xwe li ber xurtiya tifaqa dilopan ditewînin û lehî, ew şahinşehê yekbûnê ewan mîna çilowên  sivik dide pêşîya xwe, rêş dike, dimale.

Halê kurdan jî ev e. Kurd ji hev cuda dilopên baranê ne, cihê cihê tên daqurtandin. Ko gihane hev dibin lehî, lehîke mezin, tu kes, tu tişt li ber wan nikare bisekine. Felata welatê me di rabûna vê lehiyê de ye.

**Celadet Bedirxan**..

Bêrût: 28 Tebax – 1929

# Cinav

Cinav, bêjeyeke serbixwe ye, li şûna navdêrê bi kar tê û wê dinimîne.

- **Cinavên kesîn(kesane):**




Cinavên kesane li şûna navên kesan tên xebitandin.

***Nimûne:***

***Ez*** *ji dêvla te çûm ber pêz.*

***Tu*** *rindiya cîranê xwe ji bîr meke.*

***Ew*** *mirovekî baş e.*

Wek tê zanîn, sê kes di cinava kesîn de hene:




**a. Peyvok**(kesê yekem): Kesê dipeyive (ez, min, em, me).

**b. Guhdar**(kesê duyem): Kesê ku guhdar (tu, te, hûn, win).

c. **Nediyar**(kesê sêyem): Kesê nediyar (ew, wî, wê, wan).

- Cinavên kesîn du cure, **netwandî** û **tewandî**.

## 1- Cinavên kesîn ên netwandî:

Ew li şûna navdêrên netewandî tên xebtandin.

Cinavên kesîn li gor mêjerê du teşe ne:

| **Yekejmar** | **Gelejmar** |
|---|---|
| ***Ez***: *Ez bi kurdî dixwînim.* | ***Em***: *Em li derve dilîzin.* |
| ***Tu***: *Tu çi dikî ?* | ***Hûn,win***: *Hûn diçin kû?* |
| ***Ew***: *Ew xwe amade dike.* | ***Ew***: *Ew ji bazarê tên.* |

**2- Cinavên kesîn ên tewandî:**

Li şûna navdêrên tewandî tên. Cinavên kesîn ên tewandî wiha ne:

| **Yekejmar** | **Gelejmar** |
|---|---|
| ***Min:*** *Min hinarek xwar.* | ***Me***: *Me Azadî xwast.* |
| ***Te:*** *Te hevalê xwe nas kir.* | ***We***: *We keskesor dît?* |
| ***Wî****(nêr): Wî hesp ajot.* | ***Wan***: *Ewan gulên sor anîn.* |
| ***Wê****(mê):Wê helbestek xwend.* | |

**2- Cinava rajer(vegerok) ''xwe'':** Ew dikeve şûna navdêrên mêza, nêrza, yekejmar û gelejmar. Cinava ''xwe'' netê kesandin.

***Nimûne***: *Wî xwe parast. Wê xwe parast. Wan xwe parast.*

- **Cinavên xwemalîn(arzî)**:

Cinavê xwemalîn ji cinaveke qersene ku tişt dinimîne û ji cinaveke kesîn ku xudiyê tişt dinmîne pêk tê.

- Ji bo yekejmara nêrza: yê min. Yê te. Yê vî. Yê me... Pênûsê min... yê min
- Jibo yekejmara mêza: Ya min. Ya te. Ya vê. Ya me... Lênûsa min... ya min.
- Ji bo gelejmara her du zayendan: Yên min. Yên te... Keç û xortên me... yên me.

## Rahênan

**-** Cinavên kesîn ên netewandî li cihên vala binivîse:

*…. ji kîjan rengî hez dike?…. berê darê berhev dike.*

*…. gelek nexweş im. …. zanî bi Înglîzî bixwînî.*

*…. çima dikenin? …. seba welêt dixebite.*

**-** Di vê deqê de, cinavên kesîn ên tewandî xêzekê li bin dîne:

*Me soz dabû, ku em û we emê herin seyranê. Lê te got ez ne vala me, wî got ez bêkêf im, wê lêborîn xwast, wan jî got, cihê seyranê ne xweş e. yanê we her yekî behane û astengek danî, ma bi ya we be wilo dibe?*

- li ser her cinaveke kasîn e yekejmar û netewandî hevokekê binivîse.

……………………………………………………………………

……………………………………………………………………

……………………………………………………………………

- li ser her cinaveke kesîn e tewandî û gelejmar hevokekê binivîse.

……………………………………………………………………

……………………………………………………………………

……………………………………………………………………

- Li ser cinavên xwemalîn du hevokan binivîse.

……………………………………………………………………………………………………

……………………………………………………………………………………………………


- Li ser cinava rajer (xwe) du hevokan binivîse.

……………………………………………………………………………………………………

……………………………………………………………………………………………………

- **Cinavên şanîdanê (destnîşankirinê):**

Cinavê şanîdanê li şûna navdêrê tê xebtandin û wê dinimîne.




Du cure cinavên şanîdanê hene, pîvane (**ev, ew**), û qersene **(yê, ya, yên**).



**1. Cinavên şanîdanê yên pîvane:**

Ji her du zayend û mêjeran re bi kar tên.

**Ev**: Ji bo nêzîk. *Ev mala Xanimê ye.*

**Ew**: Ji bo dûr. *Ew mirov in?!*

*Ew zinarên çiyê ne.*

**2. Cinavên şanîdanê yên tewandî:**

**a- Ji bo nêzîk:**



**Vî**: Ji bo yekejmara nêrza yê nêzîk.

*Vî xortî got.*

**Vê**: Ji bo yekejmara mêza yê nêzîk. *Vê keçê got.*




**Van**: Ji bo gelejmara her du zayendan – nêzîk. *Van xortan û van keçkan got.*

**b- Ji bo dûr:**



**Wî**: Ji bo yekejmara nêrza yê dûr. *Wî mêrî got*.

**Wê**: Ji bo yekejmara mêzza yê dûr.

*Wê jinê got*.

**Wan**: Ji bo gelejmara her du zayendan- dûr. *Wan jin û mêran got.*

**3. Cinavên şanîdanê yên qersene:**

Ew cinavên destnîşankirinê ne, bi veqetandeka navdêra ku dinimînin re bûne yek û cinavine serbixwe pêk hatine.

Ew jî ev in:

- **Yê**: Ji yekejmara nêrza re.

***Nimûne:***

***Ew/ev** xortê serkeftî hat → **Ewê/evê** serkeftî hat → **Yê** serkeftî hat.*

Yanê**, ew**/**ev** cinava şanîdanê ye, ''**ê**'' jî veqetandeka navdêra nêrza ''xort'' e.

- **Ya**: Ji yekejmara mêza re.

***Wek***:

***Ew/ev** keçka ku diçe → **Ewa/eva** ku diçe → **Ya** ku diçe.*

**- Yên**: Ji gelejmara herdu zayendan re.

**Yên** ku diçûn derve kî ne?.

- **Cinavên lihevxistî**:

Ew ji têkelhevbûna hin daçekan bi cinavên şanîdanê yê tewandî hatine pê.

**Daçek** ev in: ji, li, bi, di. **Cinav** jî ev in: wî, wê, vî, vê.

**Cinavên lihevxistî** jî wiha ne: **Jê, lê, pê, tê**.

***Ji wî/wê*** *re got..* ***jê*** *re got****.*** ***Li wî/wê*** *nihêrî..* ***lê*** *nihêrî.*

***Bi wî/wê*** *şa bû..* ***P****ê şa bû.* ***Di wî/wê*** *de rûnişt..* ***t****ê de rûnişt.*

- **Cinavên pirsyariyê:**

Cinava pirsyarkî rewşa pirsyariyê destnîşan dike û dide nasîn. Cinavên pirsiyarkî yên sereke ev in:

**= Ji bo kesan:**

**- Kî**: *Kî çû kar? Ez çûm kar. Kî hat? Ehmed hat.*

**- Kê:** *Kê nan xwar? Min xwar. Kê av da te? Min da te.*

**= Çi**: **Ji bo tiştan û lawiran**.

*Tu çi dixwazî? Ez dermên dixwazim.*

*Ew çi dike? Ew şoran dike.*

**= Çiqas: Ji bo çiqasî û tibabê ye**.

*Çiqas katjmêr ji bo kar mane?*

*Didu mane.*

*Çiqas mirov li wir bûn? Dora deh mirovan.*

*Çiqas şagirt amade ne?*




- **Cinava girêkî (ku):**

Ew li dû navdêr û cinavan tê xebtandin û wateya hevokê zelaltir dike.

*Mirovê* ***ku*** *te dît hevalê min bû.*

*Ewa/ya* ***ku*** *li malê diya min e.*

*Yên ku hatine mirovên me bûn.*

**Rahênan**

-Cihên vala bi cinavê pirsiyarkî dagire:

...... heye ku tu ewqas bi xemî?! ..... got nexwaşiya te giran e? ..... ji bilî diktor kane wê şorê bike? .......... ne baş e, ku herkes xwe bike zana.

- Sê hevokan bi darêja pirsyarkî binivîse.

..............................................................................................................................

..............................................................................................................................

..............................................................................................................................

- Li ser her cinaveke nîşankirinê hevokekê bininvîse.

Ev: ......................................................................................................................

Ew:.......................................................................................................................

- Li ser her cinaveke qersene hevokekê bininvîse.

Yê:........................................................................................................................

Ya:........................................................................................................................

Yên:......................................................................................................................

- Sê hevokan li ser cinavên lihevxistî binivîse.

..............................................................................................................

..............................................................................................................

- **Mijar**:

Çend hevokan li ser roja xwe binivîse, tê de cinava girêkî bi kar wîne.

..............................................................................................................................

..............................................................................................................................

..............................................................................................................................

# EDEBIYATA WELATÎ*


Kamîran Bedirxan

Edebiyata welatî, ew edebiyat e, ko ji jîna miletî, ji hiş û dilê wî, ji dîrok û çîrçîrokên wî, ji stran û laveyên wî hiltê. Kaniya wî, dilê milet, hiş û heyata wî ye.

Tenê ev edebiyat e, ko germ, rengîn, bi bêhin û xudan ruh e.

Ji vê edebiyatê, dengê bilûr û dîlanê, stranên çiyê, zîziya evîn û hezkirinê bi teptepa dilan ve tên bihîstin.

Piraniya miletan pirîcar ev rastiya seh ne dikirin, ber ne diketin.

Li Ewropayê, miletin hebûn ku hej zimanên xwe ne dikirin. Zimanên xwe biçûk, teng, nespehî û nehêja didîtin. Ev hal di welatên Rohelatî de jî dihat dîtin. Herwekî di nav kurdan de, heçî mirovên zana radibûn kitêbên xwe ne bi zimanê kurdî bi zimanê biyaniyan dinivîsandin.

* - Dr. Kamiran Alî Bedirxan- kovara Hawar. Hejmar 1- rûpel 6/ sal 1932.

Piştî xebata sedsalan, di welatên Ewropa û Rohelat de hate seh kirin ku ev rê dernakeve û ev awa naçe serî.

Çiko milet guh ne dida wan kitêban û xebata wan mirovan berxudar ne dibûn. Ji ber vê yekê ev mirovên ha vegeriyan ser zimanên xwe. Vêca xebata wan zûka berên xwe dan û milet li pey edebiyata wan çû. Bi vî awayî di nav wan miletan de edebiyateke geş û zendî çê bû.

Êdin, her kes zana, nezana, bajarî, gundî ku xwendinê zanibe, zimanê wan seh dikirin û kitêbên wan dixwendin. Ji xwe wilo jî diviya bû.

Ji ber ku ji nivîsandin û belavkirina kitêban armanc ew e ku hiş û fikrên qenc bikevin nav xelkê, di dil û serên wan de cih bigirin.

Vêca divêt ku em bi zimanê dê û bavên xwe, bi zimanê şîrîn û delal, bi zimanê kurdî, bi kurdiya xwerû binivîsin, û fikr û hisên xwe ji çîrok û stranên kurdî bigirin.

Ehmedê Xanî berî sêsed salî ew rêya ji me re vekiri bû. Lê heyf paşiyên wî pê ve ne çûn.

# Rengdêr

**-** Rengdêr, bêjeyek e bi navdêrê re tê û salixa wê xuya dike. ***Nimûne***:

*Keça kezî **zer**.* *Xortê simêl **sor**.*





**-** Rengdêr bêjeyeke ne guhêrbar e, yanê tewang û veqetandekê nastîne.

***Wek**:*

*Gula **sor û bînxweş.*** *Deriyê **bilind û fereh.***

**-** Rengdêr jî mîna bêjeyên din, ji aliyê binyata xwe ve parve sê cureyan dibin:

1. Sade: Ji bêjeyek sade pêk tê.
   *Bilind, sor, dirêj...*
2. Pêkhatî: Bi alîkariya pêrkît û parkîtan tên darijtin.
   ***Ne**rind, **bê**bext, zan**a**, bajar**î**, miro**vane**...*
3. hevedidanî: ji pevgirêdana du bêjeyan pêk tê.

*Bînxweş, bextreş, serbilind...*

- ## Beramberkirina rengdêran:

Beramberkirin bi du rengan çê dibe:

**1 -Beramberkirina ji hev bêtir:**

Ew destnîşan dike, ku taybetiya tiştekî ji tiştekî din pirtir e. Ev rewşa bi alîkariya parkîta (tir) çê dibe.

***Nimûne***:

*Ew ji min zana**tir** e... Lê ez ji wî çalak**tir** im.*

*Ew mezintir e .......... ez biçûktir im.*



**Ev mirov qelew e.**

**Ev qelew... e.**



**2- Beramberkirina herî bêtir:**



Bi alîkariya parkîta (tirîn) pêk tê.

***Nimûne***:

*Baş**tirîn** heval pirtûk e.*

*Pîs**tirîn** sincî derew e.*

**3- Beramberkirina biqaserî hev:**bi bêjeyê mîna: qaserî, qandî...

**Ev Qelew......     e.**

*Em bi qaserî hev mezin in*

*Em qandî hev bezîn.*

**Rahênan:**

- Rengdêran di vê nivîsarê de destnîşan bike:

Gava ew dibêje gulistana me ciwan e, gulên wê rengîn in, darên wê geş û bilind in, ew rast dibêje.

- Van rengdêran bi şêweya beramberkirinê têxe hevokan:

Şêrîn: ………………………………………………………………………………………

Xort: ………………………………………………………………………………………

Dilsoz:………………………………………………………………………………………

Bînxweş: ……………………………………………………………………………………

Giran: ………………………………………………………………………………………

- li ser her cureyeke rengdêrê du nimûneyan binivîse:

Sade: ………………………………………………………………………………………

Pêkhatî: ……………………………………………………………………………………

Hevedidanî: ………………………………………………………………………………

- **Mijar**:

Deqeke kurt li ser daristanekê binivîse, tê de rewşa beramberkirinê bi kar wîne.

………………………………………………………………………………………………

………………………………………………………………………………………………

………………………………………………………………………………………………

## Ji Pend û şîretên Kurdî*

- Kevirê giran ne yê lêxistinê ye.
- Aqil taca zêrîn e, li serê her kesekî nîne.
- Ax çiqas pir e, mar bi qinyat dixwe
- Şorek xweş, biharek dila ye.
- Barê kerê tiving bin jî, gur dê dîsa wê bixwe.
- Bi dostan re germ be, bi dijmin re nerm be.
- Dar bi berê xwe, mirov bi navê xwe.
- Fodilî nabe bi fîstanekî, camêrî nabe bi arvanekî.
- Geliyê kûr bê av nabe, çiyayê bilind bê ba nabe, xelkê şêrîn bê yar nabe.
- Hejîr li hejîrê dinêre nerm dibe, qawîn li qêwîn dinêre zer dibe.
- Av ji golê, nan ji êlê.
- Kurmê darê ne ji darê be dar nakeve.
- Kurmanc têr e, xew jê re xêr e!!.
- Li dewsa şêran, man kundên şikêran.
- Lome mera pîr dikin, pesin mera jîr dikin.
- Mêr bê xudan jar dibe, jin bê xudan har dibe.
- Mar çê ba ling ne diketin zik.
- Mala gur e, ne ard e, ne bilxur e.
- Şorên hêvara dikevin qulên dîwara.
- Nok digere li diranê xerab disekine.
- Devê te tijî xwîn be, li pêş kesî tif meke.
- Kezî zerên te hebin, simêl sorên xelkê jî hene.
- Zer zane, zor zane, devê tivinga mor zane.

---

* Hinek jê ji pirtûka "Bavê Gulê" Pend û şîretên Kurdî 1994 hatine birin.

# Hoker

Hoker bêjeyek e, wateya hevokê zelal û sergihaytir dike.

- **Cureyên hokeran ên sereke**:



1. **Hokera rewşê**: Ew rewşê û çawahiyê dinasîne.

***Nimûne***: *Ez **xweş** dixwînim.*

*Bextê wê **reş**(ne ride) e.*

*Ew **têr** bûye?*

Hokera rewşê bi pirsa "çawa" tê nasîn:

*Tu **çawa** dixwînî?* *Bersiv: Ez **xweş** dixwînim.*

**2. Hokera çiqasiyê:** Ji nasandina hejmarê û çiqasiyê re bi kar tê.

***Nimûne***: *Ez **pir** dimeşim.* *Ez **gelek** tî me.*

Hokera mêjerê bi pirsa "çiqas"tê nasîn.

*Tu **çiqas** dimeşî.* *Bersiv: Ez **pir** dimeşim.*

**3. Hokera demê:** Ji bo nasandina demê bi kar tê.

***Nimûne***: *Serdil **nîvro** çû û êvarê hat.*

Hokera demê bi pirsa "kengî" tê nasîn.

*Serdil **kengî** çû?*

*Bersiv: Serdil **nîvro** çû?*

*Serdil **kengî** hat?* *Bersiv: Serdil **niha** hat?*

4. **Hokera cih:** Ji bo zanîna cih bi kar tê.

***Nimûne***: *Ez ji **Efrînê** têm**,** diçim **Kobanê** û ezê herim **Qamişlo**.*

Hokera cih bi pirsa "kû" tê nasîn.

*Tu ji **kû** hatî?*

*Bersiv: Ez ji Kobaniyê hatim.*

*Tu çû kû?* *Bersiv: Ez çûm **Qamişlo**.*



Kobanî



Efrîn


Qamîşlo

5. **Hokera nakirinê:** Ji bo nakirinê bi kar tê.

***Nimûne***:

*Ez **ne** tî me û **ne** birçî me.*

***Ne** dimeşe û **ne** dixuşe!*


Ne dimeşe û ne dixuşe, lê çawa dilive?

# Diyarkirin
# ji bo xwendevanên helbesta min*

**Nîzar Qebbanî**

... û bêhiş li ser min dibêjin:
Ez derbas periyên jinan bûme .. û derneketime
û dixwazin sêdara min li dar xin
bo ku min li ser yara xwe .. helbest nivîsand
min -mîna bilî xwe- bazirganiya Heşîşê ne kir..
dizî ne kir ..
û ne kes kuşt
lê belê .. min li nîvê rojê hez kir ..
gelo ma min guneh kir

Û bêhiş li ser min dibêjin:
Ez bi helbestên xwe, ji bin fermanên ezmên derketime
Kê got hezkirin dijmantî ye li ser rûmeta ezmên?
Ezman dostê min e
Dikene ger dikenim ..

---

* Nîzar Qebbanî, karên helbestî yên siyasî yên tevahî, perçe 3, rûp11, 1986.Wergerandin: (Mihemed.E.Elî)

stêrkên wê jî zêde vedibrûsin ..
eger rojekê min hez kir ..
çi pê ve ye .. eger min bi navê yara xwe stra?
Û li her paytextekê
Wek daristaneke Kesteneyê çand..

Ezê her karê hezkirinê bikim
Mîna hemî pêxemberan
û herdem karê zaroktiyê û dilpakiyê
û zelaltiya dilan jî bikim..
û li ser karûbarên yara xwe binivîsim
ta porê wê yê zêrîn di zêrê ezmên de
bihelînim
û ez- hêvîdar im wek xwe bimînim-
zarokek bim wek dixwazim li ser dîwarê
stêrkan xêz bikim
ta li welatê min evîn bibe bi pileya bê
ez jî bibim ferhengek ji bo dilxwazên evînê
û li ser lêvên wan bibim elêf û ba

## Rahênan

- Hokeran di vê deqê de bide nasîn:

- Tu çawa yî?
- Ez baş im.
- Rewşa te çawa ye?
- Ne pir baş e.
- Çima?
- Şeva çûyî bavê min gelek nexweş ket.
- Hêvîdar im nexweşiya wî ne xedar be.
- Na! Me rakir nexweşxaneya Qamişlo û ew niha vehesî ye.
- Çiqasî di nexweşxanê de ma?
- Ne pir! Tenê dora pênc katjmêran, me bi şevê xistê û bi sibehê re derxist.

- **Mijar**:

Axaftinek di navbera te û hevalê te yê ku ji rêwîngiyê hatiye de çêbû, wê axaftinê bi çend xêzikan binivîse.

..........................................................................................................................
..........................................................................................................................
..........................................................................................................................
..........................................................................................................................
..........................................................................................................................
..........................................................................................................................
..........................................................................................................................
..........................

# Daçek



Stêrkeke geş e

Daçek bêjeyek e, li pêş navdêr, jimarnav û cinavan tê û wan dide kesandin, ango alavên tewang û veqetandekê distînin.

***Nimûne***: *Stêrk **li** ezmên vedibrûse.*

*Saman **ji** wê hez dike.*

*Temenê wî **di** pênciyan de ye.*

Gelek daçek di kurmancî de hene, lê ji wan daçekên rasteqîn pir bi kar tên, ew jî ev in:

**1. Daçekên rasteqîn:**

**Bi**: *Em **bi** zimanê xwe serbilind in.*

**Di**: *Mîtan **di** karê xwe de jîr e.*

**Li**: *Viyan **li** zanîngehê dixwîne.*

**Ji**: *Dêrsim **ji** hevalên xwe re dilsoz e.*

**2. Paşdaçek:** Pirtik in, piştî daçekên rasteqîn tên û wateya hevokê zelaltir dikin, ew jî ev in:

**De**: ***Di*** *cejna Newrozê* ***de*** *em êgir dadidin.*

**Re**: *Canê **bi** Şêro **re** êzingan dide hev.*

**Ve**: *Bangîn **bi** mal û zarokên xwe **ve** çû derveyî welêt.*

**Rahênan**

- Cihên vala bi daçek û paşdaçekên ( bi, ve, de, ji, re, li) dagire:

...... min bibore, em …… dil …… bi we…… ne û ji we û …… xebata we …… serbilind in. Emê …… vir û pê …… …… hev …… têkildar bin. Silav û rêz …… bo we hemiyan.

# Gihanek

Gihanek peyveke xweser e, bêje û hevokan bi hev ve girê dide.

***Nimûne:***

*Ez **û** hevalên xwe zimanê kurdî fêr dibin.*

*Sêvda û Ronahî bi hev re diçin zanîngehê*

*Eger ku win **jî** dixwazin fêr bibin mamoste amade ye.*

- **Gihanekên sereke** ev in:

**Û**: *Ez **û** tu çûn seyranê.*

**Jî**: *Em jî bi makînê hatin.*

**Yan**: ***Yan*** *Kurdistan **yan** neman.*

**Lê**: *Ew şêrîn e **lê** ez şêrîntir im.*

**Ku**: *Wî got **ku** ewê bixwîne.*

**Loma**: *Ew xortekî baş bû, **loma** min jê bawer kir.*

**Eger**: ***Eger*** *ez herim , ez pir namînim.*

**Ji bo ku**: *Ew çû derve **ji bo ku** bixwîne.*

**Ji ber ku**: *Ew nexweş ket **ji ber ku** cixare vedixwar.*

Em tev bi zimanê xwe dixwînin, dinivisînin û pê daxivin jî , em zimanê xwe diparêzin!!



## Rahênan

- Pênc gihanekan di hevokan de bi kar wîne:

1 ………………………………………………………………
2 ………………………………………………………………
3 ………………………………………………………………
4 ………………………………………………………………
5 ………………………………………………………………

- Xêzikan li bin gihanekan dîne û wan li jêr binivîse.

*Ji ber ku dewlet li zimanê Kurdî mikûr ne hatiye, loma jî dibistanên zimanê Kurdî tunene û em nikanin bi fermî bi zimanê xwe bixwînin, lê belê ew tişt li pêş me ne bûye asteng ku em zimanê xwe fêr ne bin û fêr jî ne kin. Erê me niha malên xwe kirine dibistan, lê belê ew bixwazin nexwazin, zarokên me dê zimanê bav û kalên xwe ji bîr ne kin û dê li siberojê li dibistanan pê bixwînin.*

……………………………………………………………………………………………………………………
……………………………………………………………………………………………………………………
……………………………………………………………………………………………………………………
………………………………………

# Baneşan

Bangnîşank alavek e, nîşan dike, ku mirovek gazî mirovekî din dike. Di vê rewşê de navdêr li gor zayend û mêjera xwe hin parkîtan werdigire. Ew parkît jî ev in:

**O**: Ji bo yekejmara nêrza. *Xorto!*

**Ê**: Ji bo yekejmara mêza. *Keçê!*

**Ino**: Ji bo gelejmara herdu zayandan. *Xortino! Keçino!*

*Lo hevalino ! Bêjine erê ,win li kû ne lo!?*

Carina bêjeyên matnîşankê jî di rewşa baneşaniyê de bi kar tên, bi tevahî ew jî wiha ne:

- **Gelî**: Di rewşa gelejmariyê de bi kar tê.

**Wek:** ***Gelî*** *guhdaran! îro roja me ye.*

**-Lo**: Ji bo zayenda nêrza. ***Lo*** *lo şivano!*

- **Lê**: Ji bo zayenda mêza. ***Lê*** *lê dotmamê!*
- **Ey**: *Ji her du zayendan re.* ***Ey*** *felekê bêbextê!*






## Rahênan

- Baneşaniyê di vê deqê de destnîşan bike û li jêr binivîse:

*Keçino! Xortino! îro roja azadiyê ye, azadî nêzîk bû ye. Gelî biraderan! Divê em jî di nav gelên cîhanê de serbest û serfiraz bibin. Ey xorto! Ey keçê! Barê gelê me li ser milê we ye, win paşroj û hêviya gelê xwe ne, doza azadbûna wî di destê we de ye, bi destê we geş dibe, û bi xebata we ava dibe.*

……………………………………………………………………………………………………………

……………………………………………………………………………………………………………

**- Mijar**:

Peyvegotarekê binivîse û ji hevalên xwe re bi deng bixwîne.

……………………………………………………………………………………………………………
……………………………………………………………………………………………………………
……………………………………………………………………………………………………………
……………………………………………………………………………………………………………
……………………………………………………………………………………………………………
……………………………………………………………………………………………………………
……………………………………………………………………………………………………………
……………………………………………………………………………………………………………
……………………………………………………………………………………………………………
……………………………………………………………………………………………………………
……………………………

**Helbest**

# Ehemedê Xanî

**E. Xanî û Qelemê**:

**Gotina Xanî:**

Lê lê qelemê, te jî gelek dirêj kir
Bes e,  te ev kaxez gelek qirêj kir
Her çend ku peyv mîna mirarî,  mîna durr be
Bêqedir dibe ew, dema ku pir be
Ma tu nabînî ku bi rûmet in cewahir!
Lewra hindik in nadir in nadir!

**Gotina qelemê:**

Go:  Ehmed, eger tu ne xebîs î
Herçîyê ku te got,  min ew nivîsî
Eger qenc, eger xirab in, peyv û gotarên te
Eger şaş, eger rast in tevger û kirdarên te
Hey karxirab tu qenc dizanî
Tu gotox û kirox û xwendiyê wan î.

Saqî, were bêje min çi lewn e
Ev kewna xiyal e yan xewn e
Mebêje ew pûç û betal e
Salix mede ku ew xeyal e
Gerçî dikeve reng û awayê jîyanê destpêka wê
Lê belê mirin e, ew e amanca wê
Yanê  ew hebûneka  bêhebûn  e.

***E. Xanî... ji Mem û Zînê***

# Jimarnav (Hejmar)

Jimarnav navdêr in, hejmara tiştan didin nasîn.



Destên xwe daniye ser pêplûkê........................
Lingên xwe jî li ser a .........

- **Cureyên jimarnavan:**

**- Jimarnavên bingehîn:**

Ji (zîro-sifir = 0) û berjor.. Sifir- yek- didu...

0 , 1 , 2 ...... 99 ......... 301 .........

10050 .......................

**- Jimarnavên rêzîn:**

Rêz û pileyê xuya dikin, ew bi danîna parkîtên (em, emîn) li dawiya jimarnavan çê dibe.

***Wek***: *Yekem(yekemîn), nodem(nodemîn), sed û dehem(emîn).*

**- Jimarnavên birewîn(dabeşkirî):**

Jimarnavên birewîn bi du şêweyan çê dibin:

**1**. Bi anîna (yek) li dawiya jimarnavê.

***Wek*:**

*1/4 = çaryek* *1/8= heştyek* *1/10= deheyek*

**2**. Bi anîna daçeka (ji) li pêş jimarnavan.

***Wek:*** *1/4 =Ji çaran yek. 3/9 = Ji nehan sisê. 2/5 =Ji pêncan didu.*

## Rahênan

- Van hejmaran bi şêweya rêzîn binivîse:

2……  , 6……  , 8……  , 11……

- Van hejmaran bi şêweya birewîn binivîse:

3/4 … … … … … , 5/6 … … … … …

1/9 … … … … , 4/7 … … … … …

- Van jimaran bike nivîs û bûyerên wan dîrokan bide nasîn:

1946:

……………………………………………………………………………………………………

………………………………………………………………………………………………………………

1925:

……………………………………………………………………………………………………

………………………………………………………………………………………………………………

1639:

……………………………………………………………………………………………………

1514:

……………………………………………………………………………………………………

………………………………………………………………………………………………………………

2004:

……………………………………………………………………………………………………

………………………………………………………………………………………………………………

1957:

……………………………………………………………………………………………………

………………………………………………………………………………………………………………

## Kîtine bijarte Ji wêjeya Daxistanî*

- Du sal gerek in ku mirov hîn dengkirinê bibe, lê şêst sal gerek in, da ku hîn bibe deng neke.



Resûl Hemzetof

- Mirov li du rewşan xwe berdide ser çokan: Ji bo avê ji kaniyê vexwe, û ji bo gulekê jêke.

- Bila bêjin zimanê gelê min xizan e. Lê ji bo min, ez kanim bi zimanê xwe tiştê ku dixwazim bêjim, û daku raman û hestên xwe derînim, ne mohtacî zimanekî din im.

- Yê ku berî şer di encamê bifikire ne dilêr e.

- Kaniya biçûk, lezok û xumxumokî nagihê deryayê, lehiya hêdî û giran wê dadiqurtîne.

- Mêvan hergav ciwan e, lê ew ciwantir e gava pişta xwe dide mera.

* Ji pirtûka ((Daxistan Welatê min e)) ya Resûl Hemzetof. Wergerandin ji erebî: Mihemed.E. Elî.

- Şêniyê çiyan dibêjin: Cihê xençerê yê ewletir kolana(qina) wê ye, yê êgir jî tandira wî ye, yê mêr jî mala wî ye.

- Sinciyeke çiyayîyan: Zevî û malê xwe bifroşe, her tiştekî xwe ji dest xwe bide, lê mirovê di hundurê xwe de mefroşe û ji dest xwe mede.

- Em bi xem û nerazîbûnê li zarokên ku bi zimanê gelê xwe nizanin dinêrin. Ew zarok jî dê û bavên xwe lome dikin, ji ber ku wan ew hîn zimanê xwe ne kirin. Ew hemî mirov tenê hêjayî mixabiniyê ne.

- Nivîsek li ser tenbûrekê: Win guman dikin ku têl awazan çê dikin? Na! Ew ji dengvedana gotinên ku di dil de çêdibin in.

# Lêker

- **Lêker:**

Lêker bêjeyeke guhêrbar e, raman, kirin û bûyînê dide nasîn.

***Nimûne***:

*Welatê me **dikele** ...*

*Em ji welatê xwe bi dûr **ne ketine**...*

*Roj ji Rohilatê **hiltê** ...*

*Dilê dayîkê bi zaroyan re **ye**.*




***Terzî** cilan **didrû***



**Ew çi dike?**

..................................



**Ew çi dike?**

.....................................

Bêjeyên reşkirî di van hevokan de lêker in, ew kar, raman, bûyer, tiştê ku bûye û tê kirin didin nasîn. Di Kurmancî de bi tevahî lêker li dawiya hevokê tê.

- **Rader:**

Rader (jêder) mîna navdêrên mêza tên nasîn û veguhastin.

***Nimûne:***

Radera **xwendin**: *Xwendin**ê** bike (tewang).*

*Xwendin**a** bilin bike (veqetandek).*

- Rader jî ji aliyê binyê ve mîna navdêran çar cure:

  **Sade**, **pêkhatî**, **hevedidanî** û **bargiranî**.

1. Raderên **sade:** *hatin, xwendin, çandin.*
2. Raderên **pêkhatî:** *Rabûn, hilketin, vedan.*
3. Raderên **hevedidanî**: *avabûn, sipîkirin, cihêxwastin.*
4. Raderên **bargiranî**: *lihevhatin, devjêberdan, pêbawerkirin.*

- Gava ku rader bi serê xwe be, ew mîna bêjekê tê nivîsandin, lê gava ku rader tê kesandin, her pêkhatiyeke wê cuda tê nivîsandin.

*Avabûn: Ava <u>bû</u>, Sipêkirin: Sipî <u>kir</u>, Cihêxastin: Cihê <u>xwast</u>, Lihevxistin: Li hev <u>xistin</u>, Devjêberdan: Dev jê <u>berdan</u>.*

- Raya (koka) lêkerê ji radera lêkerî ya sade ku li jor xêzik di bin de ne dertê. Piştî ku raya lêkerê hat zanîn, wê hîngê ew li gor dem, kes û raweya wê tê veguastin.

# Pergalên lêkerê

**Kesên lêkerê**:

Hejmara kesan di lêkerê de bi nîşandekên taybet tên nîşandan. Ew nîşandek bi paşiya lêkerê dikevin.

Sê kes di lêkerê de hene:

1. **Peyvok**: Kesê ku daxive, nîşandeka wî **''im''** e.

***Nimûne***:

*Ez li ser têxt radiz**im**.*

2. **Guhdar**: Kesê ku axaftin pê re dibe, nîşandeka wî **''î''** ye.

***Nimûne:***

*Sorgulê! Tu li wir çi dik**î** ?.*

3. **Nediyar**: Kesê ku axaftin li ser e. Nîşandeka wî **''e''** ye.

***Nimûne***: *Çinar li malê rûniştiy**e**.*

- Nîşandeka **gelejmariyê ya hersê kesan jî ''in''** e.

*Ez, tu û wan em li ber roniya hêvê rûnişt**in**.*

**Lêker** Ji aliyê hebûn û rengê bireserê ve du cure ne, têper(gerguhêz) û têneper (negerguhêz).

1. Lêkera **têper**: Biresera durust distîne.

***Nimûne***:

*Memo **sêv** perçe kir...* *Zîn **cilan** didrû.*

2. Lêkera **têneper**: Ew biresera nedurust- ku daçek li pêş e-distîne.

    *Cano **bi balefirê** çû...*

    *Gulê **bi** dilê xwe kir...*



*Pereşûtvan difire*

Karê pereşûtvan naçe ser kesekî din(bê bireser)

# Rahênan

- Cihên vala bi nîşandekên kesan(**im, e, î, in**) dagire:

*Şiyar ji birayê xwe re got: Her sibehê ez li kata şeşan şiyar dib.... . Lê tu dereng ji xew radib.... , Xemgîn jî dereng radib.... Biracan wilo nabe! Gerek e win qîret bik.... û zû şiyar bib....*

- Cureyên raderan li gor binyata wan binivîse û li ser her yekê du nimûnan wîne:

..........................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

# Demên lêkerê

Di Kurmancî de sê demên lêkerê yên sereke hene: Borî, niha û wêbê. Ji bilî wan raweya lêkera fermanî jî heye. Lêker, dem û raweyên wê li ser bingeha raya (koka) lêkerî ya ku ji raderê dikişe tê avakirin.

- **Raya lêkera dema borî:**

Lêkera sade ya dema borî ew raya vê demê ye, bi gelemper, ew li gora vê rêzikê ji raderê dikişe:

Parkîtên raderî ''in , n'' ji paşiya raderê dikevin û çi ma ew ''ra'' ya lêkerê ye.

**Rêzik:**

| **Rader - Parkîta raderê** = **Raya lêkerê** |
|---|

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| ***Nimûne***: *Birin* | - | *in* | = | *bir.* |
| *Kirîn* | - | *n* | = | *kirî* |
| *Vexwarin* | - | *in* | = | *vexwar.* |

## Dema borî:

Demên borî yên sereke yên ev in:

### 1. Boriya borî:

Ew xuya dike, ku karek berê bûye û derbas bûye.

Ev e **rêzika** çêkirina vê demê:

| **Raya dema borî + nîşana kesan** |
|---|

***Mînak:***

*Ez **çûm** karê xwe.* *Tu **çûyî** karê xwe.*

*Ew **çû** karê xwe. Em, win, ew **çûn** karê xwe.*

2. **Boriya berdest:**

Ev dem xuya dike, ku karek berê dibû û dihat kirin.

***Nimûne:***

*Ez **diçûm** malê.* *Tu **diçûyî** malê.* *Ew **diçûye** malê.*

*Em, win, ew **diçûn** malê.*

Ev dema bi alîkariya berlêker ''di'' çê dibe. Rêzika çêkirina vê demê wiha ye:

| |
|---|
| **Berlêker (di) + raya dema borî + nîşana kesan** |

- **Raya lêkerê di demên niha, wêbê û fermanî de:**

Ew li ser binyata lêkera fermanî radibe. Piştî ku berlêker (bi) û nîşana kesan jê têne avêtin.

***Rêzik:***

| |
|---|
| **Raweya fermanî – berlêker (bi) û nîşana kesan = Raya lêkera fermanî** |

| | | |
|---|---|---|
| ***Nimûne**: Çûn* | *biçe* | *ç* |
| *Nasîn* | *binase* | *nas* |
| *Kirin* | *bikin* | *k* |
| *Hildan* | *hilde* | *hild* |

1. **Dema niha**:

Ev dema xuya dike, ku karek niha di dema axaftinê de dibe û tê kirin.

Ew bi alîkariya berlêker **''di''** çê dibe. Û **rêzika** darijtina wê wiha ye:

| **Berlêkr (di) + ra + nîşana kesan** |
|---|

***Nimûne***:

*Ez ava kaniyê ve**di**xw**im**. Tu gula sor bîn **di**k**î**.*
*Ew **diçe** dibistanê. Em, win, ew ji çem hez **di**k**in**.*

## 2. Dema wêbê:

Karek wê wê di dema wêbê de bibe xuya dike. Ew bi anîna pirtika ''dê'' li berî lêkerê çê dibe.

| **Dê berlêkr (bi) + ra + nîşana kesan** |
|---|

***Nimûne***:

*Ez **dê** bikirim... Tu **dê** bikirî...*
*Ew **dê** bikire... em, win ew **dê** bikirin.*

| |
|---|
| ***** *Eger kirar navdêr be, berlêker ''dê'' cuda tê nivîsandin,**wek**: Diljîn **dê** here Şamê. Lê eger kirar cinavek be, berlêker ''dê'' tîpa ''d'' ji dest dide, û tîpa ''ê'' bi paşiya cinavê dikeve, wek: Ez**ê** herim dibistanê... Tu**yê** herî Kurdistanê...* |

## 3. Raweya fermanî:

Raweya fermanî rewşa fermaniyê destnîşan dike. Raweya fermanî bi alîkariya berlêker ''bi'' çêdibe. Ew li pêşiya raya fermanî tê û nîşandekên kesan jî ''**e**'' ji bo yekejmariyê û **''in''** ji bo gelejmariyê li paşiya wê tê.

**Rêzik:**

**Berlêkr (bi) + ra + nîşana kesan (e, in)**

***Nimûne***:

*Karê xwe baş **bi**k**e** .. Karên xwe baş **bi**ki**n**.. Serê xwe hilîn**e**.*

***** *Mîna ku me di hevoka jorîn de(Serê xwe hilîne) dît, di lêkera pêkhatî de, berlêkera raweya fermanî ''bi'' netê xebitandin.*

***** *Gava ku tîpa dawiya lêkerê dengdêrk be, nîşandeka yekejmariyê ''e'' dikeve, û ya gelejmariyê ''in'' jî tîpa xwe ''i'' winda dike*: *Rabe destê xwe **bi**şo. Rabin destên xwe **bi**şo**n**.*

## Rahênan

- Di van hevokan de, berlêkerên ''bi, di'' û pirtika ''dê'' bi xêzikan nîşan bide, û dem û raweya lêkerê li ber binivîse:

Lawo! Bixebite! Bixwîne!..................

Baranê giran lêdikir, lê dîsa me xwepêşandan kir..................

Buhar e, gupik dibişkivin û gul vedibin..................

Xewna azadiyê wê bibe rastî, û hêviya wê dê bi cih were..................

- Çawa raya lêkera dema borî ji raderê dertê, rêzikê û du nimûnan binivîse:

..........................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

- Çawa raya lêkera fermanî ji raderê dertê, rêzikê û du nimûnan binivîse:

..........................................................................................................

..........................................................................................................

- Li ser her demeke lêkerê û raweya fermanî hevokekê binivîse:

........................................................................................................................

......................................................................................................................

**Mijar:**

Te duh çi dikir, îro çi dikî û siba dê çi bikî? bi çend hevokan salix bide.

## Helbest

# Ehmedê Xanî.. Mem û Zîn

**Ehmedê Xanî** dibêje, min ji ber vê yekê bi Kurmancî nivîsand:

*Da ku xelqî nebêjtin ku Ekrad*
*Bê marîfat in bê esil û binyad*

*Him ehlê nezer nebên ku kurmanc*
*Işqî nekirin ji bo xwe amanc*

*Fîlcumle ne cahil û nezan in*
*Belkî di sêfil û bêxwedan in.*

* * *

Kesên ku bi eslê xwe xirabsirişt in
Ma ew esil ji wan qet tê şuştin!

Çil sal tu Ĥenzelê biçînî
Û sed av tu bidî wê bihingivînî

Wî xwedî bikî û bigîhînî tu bi tavê
Û her dem lê bireşînî tu gulavê

Her roj tu reha wê biqelêşî û şeq bikî
Û wê qelşê tijî şekir bikî

Û xizmet bikî tu jê ra wek Hindîyên çavreş
Ma ew ji te ra qet dibe zebeş

Divê tu nefikirî ku dema ew ber bide
Ew dê xeynî ji taliyê çû fêkî û ber bide


***E.Xanî..***

# Lêkera "bûn" di dema niha de

Lêkera "bûn"ê di dema niha de şêwene taybet distîne.

Van hevokan bixwîne:

| **<u>Dema borî</u>** | **<u>Dema niha</u>** |
|---|---|
| *Ez berê karker <u>bûm</u>.* | *Ez niha karker **im**.* |
| *Tu berê çotkar <u>bûyî</u>.* | *Tu niha cotkar **î**.* |
| *Ew berê rêncber <u>bû</u>.* | *Ew niha rêncber **e**.* |
| *Em berê şagirt <u>bûn</u>.* | *Em niha şagirt **in**.* |




- Ji van hevokan diyar dibe, ku lêkera "bûn" di dema niha de, li gor kes û mêjera xwe van şêweyan distîne:

Ji bo kesê **Peyvok ê** yekejmar: **im.**

Ji bo kesê **Guhdar ê** yekejmar: **î**.

Ji bo kesê **Nediyar ê** yekejmar: **e**.

**Gelejmariya hersê** kesan: **in.**


- Eger tîpa dawiya navdêrê tîpeke dengdêr be, lêkera "bûn"ê van şêweyan distîne: Im ⟶ me.

î ⟶ yî. e ⟶ ye. In ⟶ ne.

***Nimûne***:

*Ez dêrî me.   Tu Ronî yî?.  Ew birçî ye.  Em, win û ew rêwî ne.*

**Têbînek giring**: *Di hevokên jorîn de, cinav û navdêrên (ez, tu, ew, Azad, em, win, ew) **serwer** bi nav dibin, û bêjeyên (karker, cotkar, rêncber, şagirt, dêrî, ronî, birçî, rêwî) **seredanî** tên nasîn. Ji xwe, (-im -me, -î -yî, -e-ye, -in-ne) jî raweyên dema niha ya lêkerê alîkar ''bûn'' in, ew jî cuda û bi serê xwe li dawiya hevokê li paş seredanî tê nivîsandin.*



## Rahênan

- Raweyên dema niha ya lêkera bûnê (me, ye, ne,yî, im, e, î, in) di cihên vala de binivîse:

*Ez Kurd ......, zimanê min Kurdî ...... , ez xwazgêncî ...... , em xwazgênciyê azadiyê ...... , tu jî wilo ...... , tu jî bindest ...... , ew jî bindest ...... , loma jî em tev azadîxwaz ......*

**- Mijar:**

Te mirovek dît, we xwe bi hev da nasîn, û te li ser xwe jê re deng kir. Çend xêzikan li ser vê mijarê binivîse.

..........................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

..................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

.......................

## Helbest

# Şîna ser şagirtên Amûdê*

**Seydayê Tîrêj**

Şermola hejar li rûyên erdan
Wey war û cihê xeman û derdan
    Rabe vê sibê xwe reş girêde
    Karwanekî mezin va tê ji rê de
Karwanekî bi hêl û mêl û nîşan
Va tête ji Amûda perîşan
    Ne koçer in ew, ne warguhêz in
    Westane li pêy hev , ew bi rêz in
Nêzîk in ne dûr in, xweş xuya ne
Wek teşneyê rahê Kerbela ne
    Mêvan in, delal in pir ezîz in
    Hilmiştî ne paqij in, temîz in
Sînga xwe veke li ber delalan
Hembêz bike xweş ewan şepalan
    Zaro ne, ciwan in nû gihîştin
    Ew teyrik û bilbilên bihiştin
Amûd li wan bûye pêt û agir
Neçare revîn berê xwe dane vir
    Zanin ku tu dayîka henûn î
    Bê şik e, li ser wan dê tu rûnî
Rêber Mihemed kurê Seîd î
Sed rehmet li gora wî şehîd î

* Malikin ji helbesteke Seydayê Tîrêj, dîwana "Xelat", rûp110, 1991.

# Darêja ''Hatin-Kirin'' (pasive voice)

Hin caran karek dibe, lê kirarê wê ne nas e. Danasîna wê rewşê bi alîkariya darêja ''hatin kirin'' çê dibe.

***Wek***:

*Ez **hatim dîtin.*** *Ew **tê girtin.*** *Em **werin verêkirin.***

Di van nimûnan de xuya dibe, ku ew bi rêya veguhastin lêkera alîkar (hatin) çê dibe, lêkera bingehîn jî di raweya xwe ya raderî de dinimîne.

***Nîmûne :***

*Diz **hatin** <u>girtin</u>.* *Diz **tên** <u>girtin</u>.*

*Diz **hati bûn** <u>girtin</u>.* *Diz dê **werin** <u>girtin</u>.*

## Rahênan

- Di vê deqê de darêja ''hatin kirin'' bi xêzekê dest nîşan bike û li jêr binivîse.

*Hevalê me Dr. Şêrzad bi xinizî hat kuştin. Lê kuştar zû hatin naskirin û hatin girtin, birastî bawer ne dibû dê zû werin girtin. Darebesta pakrewanê delal û bijîşkê zana ji hêla bi hezaran kes ve hat pêşwazîkirin, li ser dest û seran hat gerandin û li mezelê gundê Elendara hat veşartin. Gotin û gotarên zor nirxdar û bi şewat ji hêla heval, dost û xudiyên wî ve li ser gora wî hatin gotin.*

..........................................................................................................

..........................................................................................................

........................................................................................................

# Raweya neyînî ya lêkeran

Raweya neyînî ya lêkeran bi alîkariya daçekên **''ne, na, ni**, **me''** çê dibe. Ew daçek li pêş lêkerê tên nivîsandin.

## 1- Neyîniya lêkera dema borî:

Neyîniya lêkera dema borî bi daçeka ''**ne**'' pêk tê.

***Nimûne***: *Ew* ***ne*** *çû kar...* *Ew* ***ne*** *diçû karê xwe.*

## 2- Neyîniya lêkera dema niha:

Neyîniya vê rewşê bi daçekên ''**na**, **ni**'' pêk tê.

*Ez wê derewê* ***na****kim...* *Ez wê darê hil****na****kim.*

*Ez* ***ni****karim derewan bikim...*

## 3- Neyîniya lêkera dema wêbê:

Raweya neyînî bi alîkariya daçeka ''ne'' pêk tê.


*Xemgîn dê* ***ne****çe derve...* *Xemlîn dê kesî hil****ne****bijêre.*

## 4- Neyîniya raweya fermanî:

- Bi alîkariya daçeka **''me''** çê dibe.

***Nimûne*:**

*Vexwarina cixarê* ***me****ke kar... Ji neyarî re* ***me****be alîkar.*



## Rahênan

- Li ser her demeke lêkerê û raweya fermanî hevokekê di rewşa neyînî de binivîse.

Borî:

.........................................................................................................................

Niha:

.........................................................................................................................

Wêbê:

.........................................................................................................................

Fermanî:

.........................................................................................................................

- **Mijar:**

Ziyanên cixarê yên ku win dinasin, bi çend xêzikan hewaldin û şîretên xwe bêjin.

.........................................................................................................................
.........................................................................................................................
.........................................................................................................................
.........................................................................................................................
.........................................................................................................................
.........................................................................................................................
.........................................................................................................................

## SERHILDANÊN KURDAN (1800-2000)*

Di destpêka çerxa nozdan de, hesta netewî li Ewrupayê serî hildida, û gelên Ewrupayî xebat dikirin daku dewletine yeknetewe û yekziman ava bikin. Li Rojhilata Navîn jî, dewleta Osmanî gelek milet kiri bûn bin destê xwe û di nezaniyeke tarî de kûr kiri bûn.

Ew hest û ramanên netewî yên ku li Ewrupayê geş bû bûn, kenca xwe davêtin ser Rojhilata Navîn jî.

Gelê Kurd, ê ku Osmaniyan bi darê zorê zep kiri bûn, hestên netewî li ba wî jî germ dibûn; di dilên hinek mîr û axayên Kurd de, vîna serxwebûnê şîn dibû, û wan jî dixwastin bibin xwedî destlat û dewlet.

Ji wê demê de, bi dehan tevger, serhildan û şoreşên Kurdan rabûn û bi sed hezaran qurban jî hatin dan. Lê mixabin, Kurd bi ser ne diketin û hêviyên wan ên netewî têk diçûn .

Em kanin tevger û raperînên sereke yên ku li Kurdistanê rabûne, weha bijmêrin:

Serhildanên: Ebdirehmanê Baban li Silêmaniyê 1806an. Mihemed Paşayê Rewendozî 1810an. Îsmaîl

*- Mihemed Ebdo Elî.

Paşayê Behdînanî 1835an. Bedirxan Paşa 1848an. Ezdîn Şêr 1853an. Serhildana Dêrsimê 1877-1878an . Lawên Bedirxan Paşa 1877- 1889an. Şêx Ubêdelayê Nihrî 1880yî. Tevgera Bedlîsê 1913an. Şoreşa Şêx Mehmûmdê Hefîd 1919an. Tevgera Simko Axa 1922an. Şêx Seîd 1925an. Îhsan Nûrî Paşa li çiyayê Agirî 1927-1931an. Elî Riza li Dêrsimê 1937an. Barzan 1943an. Komara Mehabadê 1946an. Şoreşa Îlûnê 1961ê. Kurdistana Îranê 1979an. Tevgera PKK 1984an.

Lê belê di nav serhildanên çerxa bîstan de, tevgerên herî bi navûdeng, serhildanên Barzaniyan bûn. Wan ji destpêka sedsala bîstan de, û ra 1943an, herdem tevgerên çekdar li dijî hêzên Înglîz û Îraqê radikirin. Di sala 1946an de jî, li dema Komara Mehabadê, Barzaniyan bi serokatiya têkoşerê nemir Mistefa Barzanî ji Komarê re dibûn parêzvanên dilsoz.

Piştî ku Komara Mehabadê têkçû, M.Barzanî ligel 500 şervan berê xwe da Sovyetistana berê, û ra sala 1958an li wir ma, û di wê salê de, jiserkînûve vegerî Îraqê.

Gava destlata Îraqê ya wê hîngê li mafên Kurdan mikûr ne hat, Mistefa Barzanî, di sala 1961an de şoreşa Êlûnê rakir. Di şerê azadiyê de, pêşmergeyên

Kurdistanê li dirêjiya neh salan şerekî serkeftî kirin, hîngê dewleta Îraqê neçar bû lihevkirina 11ê Adara 1970yî mor bike, û li hinek mafên Kurdan mikûr were.

Piştî wê demê, her du destlatên Tehran û Bexdê Li 6ê Avdara Sala 1975an li Cezaîrê li hev kirin û şoreşa Êlûnê têk birin. Lê belê wê şoreşê bingeheke xurt ji raperîna Adara sala 1991ê re amade kiri bû, û herwiha hêviyên gelê Kurd bi wê raperînê hatin vejandin û dîsa geş bûn, û bi milyonan Kurd azad bûn.

# Xaleşanî

Xaleşan, nîşandekine taybet in, di nav bêjeyên hevokê de tên û nivîsê diyartir dikin. Xaleşanên ku pir bi kar tên ev in:

1. **Xale (.):** Li dawiya hevokê, li ber kurtenivîsan û di navbera hejmarên dîrokan de tê danîn.

***Nimûne***:

*Li roja 19.4.2013an, Hawar çû karê xwe***.** *Zarok jî çûn dibistanê***.** *Dr. Azad jî çû seredan newaxşan.*

2. **Bihnok (,):** Bihnok di van cihan de tê xebtandin:

- Di navbera du hevokan de:

***Nimûne***:

Rastî ev e, belkî ne bi dilê te ye, lê gerek e tu bawer bikî.

- Di navbera bêjeyên ku di hevokê de li dû hev tên, û wate û kardayînê zelal dikin.

***Nimûne*:**

*Rastgoyî, dilsozî, rûmetdarî û dilpakî ji sinciyên baş in.*

*Gulên sor, zer, sipî û aravî gulistan xemilandine.*

*Em çûn, hatin, me karê xwe jî kir û hîn tu razayî.*

3. **Matnîşank (!):** Matnîşan, li dawiya hevokên ku bang, ferman, gotar, û matmayînê xuya dikin, tê bikaranîn.

***Nimûne*:**

*Lo Memo!     Wex li min!     Here!    Gelî guhdaran!*

4. **Pirsnîşank (?):** Pirsnîşan li dawiya hevoka pirsyariyê tê û rewşa pirsyariyê dide zanîn.

***Nimûne***:

*Zimanê te çî ye**?**   Welatê te kû ye**?***

*Çima ji welatê xwe dûrî**?***

- **Xalecot (:):** Xalecot, li destpêka peyva peyvdarekî tê danîn.

***Nimûne***:

*Ciwanemerg Qadî Mihemed got: Gelê Kurd zindî ye, namire! Kurdistan jî dê serbixwe bibe.*

- **Kevan (  ) , ((  ))**: Gava di nivîsandinê de gotina mirovekî din hat, dikeve nav du kevanan.

***Nimûne***:

*((Zemîn li dora xwe digere)), ev gotina zanyar Gelîlo ye, ku li sala 1632an bû sedema darizandina wî.*

Aaax  ji derdê naskirina cihên van nîşandekan!?.

!   ?   ,   .   :   ;   (  )  ((  ))

## Rahênan

- Xaleşaniyên lêhatî ( , - . - : - ! - ? ) li cihên vala dîne:

*Hevalê min ji min re got (...) Gava em sibehê ji xew şiyar dibin (...) em bi herkesekî ji malê re wiha dibêjin (...) Roj baş (...) Pişt re (...) em dest (...) çav û rûyê xwe dişon (...) cilên xwe yên pak li xwe dikin (...) porê xwe şe dikin û diçin karê xwe (...)*

*Ma tu xwarina sibehê naxwî û diçî(......) Belê (...) Çawa (...) bê taşte (...) ta hişê mirov jî naxebite (...) ma ne wilo ye (.......)*

- **Mijar:**

Deqekê ji zimanekî din wergerîne Kurdî, û xaleşaniyê jî wek di wê deqê de heye dîne.

..........................................................................................................................
..........................................................................................................................
..........................................................................................................................
.......................................................

# Kokûbinyata Gelê Kurd*

Şûnewar û diyardeyên dîrokî dest nîşan dikin, ku welatê Kurdan (Kurdistan) ji serdemên pir kevin de şên bû. Di çêroka olî ya Tofanê de jî hatiye, ku çiya û çolên Kurdistanê, ji dema pêxember Nûĥ de, bûye dergûşa neweya mirov ya duyemîn.

Lêkolîn û diyardeyên nûjen dibêjin jî, ku ji berbanga dîrokê de, yanê ji destpêka hezarê sisiyan berî zayînê de, deverên çiyayî ji bakur û rojhilata Mezopotamyayê, ango li çiyayên Toros û Zagrosê (welatê Kurdan ê berê û niha), ji hêla geline kevnare ve şên bûn, navên wan gelan di belgeyên Somerî, paşê jî di yên Ekadî de hatine zimên. Ew milet di hemî qonaqên dîroka Mezopotamiya û Rojhilata Nêzîk de çalak bûn, ew gel roja îro bi (**Gelên Çiyayî**) bi nav dibin. Ew milet jî ev bûn: Lolo, Kaşî, Gotî, Horî, Sobarto, Hasî…

---

* Mihemed Ebdo Elî.

Pişt re miletine din ji deverên Bakurê Deryayên Reş û Qezwînê berve herêmên çiyayî ji Rojhilata Nêzîk hatin, mîna gelên: Med, Kêmir, Skês... Bawariyeke mezin li ba zanyarên navdar, mîna Fledîmêr Mênoriskî, Sêdnî Smês, M.E.Zekî heye û dibêje, ku ew miletên çiyayî bapîrên gelê Kurd in.

Ji hêla binyata nijadî û koka zimanê gelê Kurd de jî, zanyar M.Emîn Zekî wiha wê babetê şirove dike, û dibêje:

((Wekî ku Ereb dibêjin, ew ji silaleta Akadiya ne, ewên ku li dawiya sedsala 23an berî zayînê ji ‘‘Nîvgirava Erebî” derketine; û Tirk jî koka xwe vedigerînin miletê (Qon) ji silaleta (Şang Yong) ku li sedsala 28an B.Z li Bakurê welatê Çînê dijiyan; Em jî kanin bêjin, ku gelên Çiyayên Zagrosê wek (Kaşî, Sobar, Gotî, Xaldî, Horî), ew jî bapîrên gelê Kurd ên herî kevnar in.

Piştî serdemên destpêka dîrokê, ango ji dawiya sedsala diduyan berî zayînê de, hozine cengawer ji çolên Rûsyayê berve navçeyên Balkanê, Anadolê, Kurdistanê, Faris û Hindistanê goç kirine, ew gel di çavkaniyên dîrokî de bi navê Gelên HindûEwrupî,

yan Arî tên nasîn. Zimanên wan miletan nêzîk hev bûn, û bi (Koma zimanên Hind- Ewrupî) bi nav dibin. Piştî ku ew miletên nûhatî destlatdarî li ser gel û komelgehên Zagrosê kirin, zimanên wan jî belav bûn û hatin xebitandin, lê belê gelek gotin ji zimanên kevin yên herêmê ketin nav wan…)) /M.Emîn Zekî, par1, rûp91/.

Li ber roniya tiştên ku di gelek çavkaniyên dîrokî de hatine, û gelek lêkolînvanên dîrokzan û nijadzanînê (Entropolociya) jî li ser li hev kirine, em kanin wek encam wiha bêjin: Gelê Kurd, ji berhema têkilhevbûna miletên Zagrosê û Torosê yên kevnar û gelên ku di hezarê diduyan û yekê berî zayînê de bi ser wan de hatine, peyda bûye.

# Hevok

Hevok rêzkirina bêjeyan a bi wate ye. Ji ristin hevokan re ''peyvsazî'' têgotin.

***Wek***:



Zarok bi diya xwe re dibêjin, kengî emê herin Efrînê û di çem de avceniyê bikin.

Beş û hêmanên bingehîn ên hevoka lêkerî sisê ne: **Kirar**, **bireser** û **lêker**?.

1. **Kirar:**

Bêjeya ku di hevokê de karekî yan tiştekî dike, jê re kirar tê gotin.



Kirar di hevokê de bersiva pirsa ''kî, kê'' dide û pê tê nasîn.

***Nimûne***:

- *Rizgar li makînê siwar bû.*

**Kî**: Kî li makînê siwar bû?

Bersiv*: Rizgar (**kirar**) siwar bû.*

*Bêrîvanê porê xwe şe kir.*



**Kê**: Kê porê xwe şe kir?

Bersiv*: Bêrîvanê (**kirar**)şe kir.*

2. **Bireser:**

Ji bilî kirar û lêkerê, bireser jî hîmekî sereke ye di hevokê de. Bêjeya ku karê kirarê derbas ser dibe, jê re bireser tê gotin. Bireser bersiva ''çi'' dide.

***Wek***:

*Rohat bi wênegirê wêne kişand.*

*Rohat bi **çi** wêne girt?*

*Bersiv: Rohat **bi wênegirê** (**biresera nedurust**) wêne girt.*

*Rohat bi wênegirê **çi** girt?*

*Bersiv: Rohat bi wênegirê **wêne** (**biresera durust**) girt.*

3. **Lêker:**

Lêker li dawiya hevokê tê û hevokê û wateya wê sergihayî dike..

Bi tevahî, di hevokê de kirar li pêş lêkerê tê, bireser jî piştî kirarê tê, endamên hevokê yên din jî, mîna: Rengdêr, hoker, daçek, gihanek...hwd, li gor delametên xwe cihên xwe di hevokê de digrin.

## Rahênan

- **Mijar**:

Hest, nêrîn û pêşniyarên xwe li derbarê korsên fêrbûna zimanê Kurdî binivîse.

## Kurdên Kevnesovyetê*

Kurdên Sovyetê, Kurdên Êrîvanê, ji me dûr bûn, lê di dilê me de bûn. Min hîn di salên xwe yên gelekî biçûk de navên Kurdên Soveyetê bihîsti bû, min dizanî bû ku Kurdin hene û min texmîn dikir cihê ku ew lê dijîn jî Kurdistan e. Ji min we bû, Kurdên Sovyetê Kurdistan ava kirine, li ser axa azad û serbest dijîn; Bi zimanê xwe dipeyivin, di dibistanan de bi zimanê xwe perwerde dibin, kilamên xwe bi zimanê xwe dibêjin.

Belê, min Kurdên Sovyetê ne bi riya xwendinê nas kirin, min ew bi riya kilamên wan nas kirin. Dema ku ez behs dikim, dibe ku min hîn dest bi dibistanê ne kiri bû. Ji xwe dibistan bi Tirkî bû, mamoste Tirk bûn û em bi kultur û îdeolojiya tirkîtiyê perwerde û mezin dibûn.

Lê ew xurtedengên dengbêjên Kurdan ku bi riya radyoya Êrîvanê li seranserî Kurdistanê pêl

* Firat Ceweri, kovara Nûdem- rûp 4- hej: 31- Payîz 1999.

didan, dikirin ku hêsir ji çavên gelek jin û mêrên Kurdan werin. Ew lerza dengê wan, mîna tîrekê jî li dilê me zarokan diket. Ji xwe, di hênkahiya danên êvarê de, gava dema weşana radyoyê dihat, herkesî dev ji kar û îşên xwe berdidan û bi heyranî guhên xwe didan weşana radyoya Êrîvanê.

Lê gelek caran bi tirs û bi dizî lê guhdarî dikirin. Di gel ku kesekî biyanî li gund tunebû jî, dîsa gundî pir li xwe miqate bûn û ji tirsa ku dewlet dikare bibihîze, wan guhdarîkirina radyoyê jî mîna sirekê vedişartin.

Dîsa baş tê bîra min, gava dema stranan dihat û radyoyê dest bi perezîtan dikir, gundî hêrs dibûn, hin kesan dest bi kufurbaziyan dikirin û gazin rexneyên dinyayekê dibarandin. Hîngê diya min, ji dil devê xwe dadigirt û digot: "Welleh dijmin nahêlin ew bistirên, destên xwe dixin qirka wan".

*- Navên van wêneyan li bin binivîsin:*
êzing, gul, masî, pût, al, sol, ling.
*- Tîpa destpêkê ya van navdêrên ku xêzik di bin de ne serast bike.*
Azad, Beyazîdê , Agirî Pirsê , helbest , gotar.
*- Şêweya navdêrê a rast di cihên vala de binivîse:*
*(netewan, şêrînê, ferhêd, newroz, rojhilata navîn).*
Şêrînê, , Ferhêd . Newroz. Yekîtiya Netewan, Rojhilata Navîn.
*- Navên ku xêzik di bin de ne bi şêweya kurtkirî binivîse:*
612an B.Z . SFPZK .

***

## Wane: Kît û Bêje

*- Kîtên van bêjeyan li ber binivîse:*
Ren-gîn, roj, ar-manc, ro-na-hî, kur-dis-tan, hiş- men-dî, si-ya-set, û, yan, be-ya-zîd, la-leş, rû.
*- Kîtek bi tena serê xwe di bêjeyê de bê wate ye. Van kîtan li hev wîne, bike bêje û li ber binivîse:*
aşvan, azadî, şoreş, serhildan, hawar, çûndin, xwepêşandan, lihevhatin, welat, sazûman .

***

## Wane: Bêje

*- Cureyên van bêjeyan ji aliyê binesaziya wan de li ber binivîse:*
Aldar- P, Binavkirin-B, Welat-S, Paşeroj-H, Berçavk-B, Nêçîrvan-P, çû-S, Bindestî-B, rastî-P.

***

## Wane: Zayend û Mêjera Navdêran

*- Gelek cureyên peyvan hene: Navdêr, rengdêr, lêker, cinav û hwd, bêjeyên navdêr xêzekê di bin re bikşîne.*
Mal, keç, dem, av, merx, çiya, azadî, zik, koletî , raman.

***

## Wane: Mêjera Navdêrê

*- Navên van wêneyan li gel salixeke wê li bin binivîse:*
Şe, mişk, pênûs, pere, keç, top
- Navên van wêneyan binivîse: Kêzik, berx, hêv.

***

## Wane: Veqetandek

- *Bêjeya yekê bi veqetandeka navdêra bîna(binavkirî) sergihayî bike:*

Textê... hişk. Bayê ..... hêgin. Masiyê ... reş.

Mobayila ... nûjen. Hêva ... gulover. Zarokên... biçûk.

- *Cihên vala bi van bêjeyan dagire, û xêzekê li bin veqetandekê dîne:*

**ba**yê azadiyê rabû. **çiyayên** Kurdan ên bilind.

**keçikên** me jîr in. **welatê** me ne azad e.

**mala** gur e, ne ard e ne bulxur e.

- *Cihên vala bi parkîtên lêhatî dagire:*

Pisîkek me heye, sê çêlik kirin, çêlikan şîrê diya xwe mêtin ta mezin bûn. Çêlika sibehîtir xûşka min jê hez dikir û ji xwe re hîşt, ya din jî kurekî cîranên me heye, wî bir mala xwe.

- *Van bêjeyan di cihên vala yên lêhatî de bi cih bike, (keçek, xortek, hevalin):* Min li ser Fêsbûkê xortek ji Îranê nas kir, pişt re min keçek ji Tirkiyê û hevalin ji Hewlêrê jî nas kirin, di gel ku me hemiyan hîn hevdû nedîtiye, û em hevdû nas nakin, lê em bûne havaline îjdil.

***

## Wane: Tewandina Navdêran

- *Navdêrên kirar û bireser di van hevokan de bi awayên tewandî binivîse*: Diya min xwarinê çêdike. Azêd stran gotin. Tu wî goştî bikelîne! Em ji zarokan hez dikin. Rojînê fîstan kirî.

- *Ev navdêrên nebinavkirî di rewşa tewandî de têxe hevokan:*

Destekî. Malekê. Penaberina.

***

## Wane: Cinav

- *Cinavên kesîn ên pîvane li cihên vala binivîse:*

.... ew ji kîjan rengî hez dike? ew berê darê berhev dike.

.... ez gelek nexweş im. .... tu zanî bi Înglîzî bixwînî.

.... win çima dikenin? .... ew seba welêt dixebite.

- *Di vê deqê de, cinavên kesîn ên tewandî xêzekê li bin dîne:*

Me soz dabû, ku em û we emê herin seyranê. Lê te got ez ne vala me, wî got ez bêkêf im, wê lêborîn xwast, wan jî got, cihê seyranê ne xweş e. yanê we her yekî behaneyek û astengek danî, ma bi ya we be wilo dibe?

***

## Wane: Cinavên şanîdanê (destnîşankirinê)

*-Cihên vala bi cinavê pirsiyarkî dagire:*

Çi heye ku tu ewqas bi xemî?! kê got nexwaşiya te giran e? kî ji bilî diktor kane wê şorê bike? çiqas ne baş e, ku herkes xwe bike zana.

***

## Wane: Hoker

- Hokeran di vê deqê de bide nasîn:

- Tu çawa yî?
- Ez baş im.
- Rewşa te çawa ye?
- Ne pir baş e.
- Çima?
- Şeva çû bavê min gelek nexweş ket.
- Hêvîdar im nexweşiya wî ne xedar be.
- Na! Me rakir nexweşxaneya Qamişlo û ew niha vehesiye.
- Çiqasî di nexweşxanê de ma?
- Ne pir! Tenê dora pênc katjmêran, me bi şevê xistê û bi sibehê re derxist.

***

## Wane: Daçek

*- Cihên vala bi daçek û paşdaçekên ( bi, ve, de, ji, re, li) dagire:*

Li min bibore, em ji dil de bi we re ne û ji we û ji xebata we re serbilind in. Emê ji vir û pê ve bi hev re têkildar bin. Silav û rêz ji bo we hemiyan.

***

## Wane: Gihanek

*- Xêzikan li bin gihanekan dîne û wan li jêr binivîse.*

Ji ber ku dewlet li zimanê Kurdî mikûr nehatiye, loma jî dibistanên zimanê Kurdî tunene û em nikanin bi fermî bi zimanê xwe bixwînin, lê belê ew tişt li pêş me nebûye asteng ku em zimanê xwe fêr nebin û fêr jî nekin. Erê me niha malên xwe kirine dibistan, lê eger ew bixwazin nexwazin, zarokên me dê zimanê bav û kalên xwe ji bîr nekin û dê li siberojê li dibistanê pê bixwînin.

***

## Wane: Baneşanî

- *Baneşanan di vê deqê de bide nasîn û li jêr binivîse:*

Keçino! Xortino! îro roja azadiyê ye, azadî nêzîk bû ye. Gelî biraderan! Divê em jî di nav gelên cîhanê de serbest û serfiraz bibin. Ey xorto! Ey keçê! Barê gelê me li ser milê we ye, win paşroj û hêviya gelê xwe ne, doza azadbûna wî di destê we de ye, bi destê we geş dibe, û bi xebata we ava dibe.

***

## Wane: jimarnav

- *Van hejmaran bi şêweya rêzîn binivîse:*

2 - duyem în , 6- şeşemîn, 8- heyştemîn, 11- yazdemîn.

- *Van hejmaran bi şêweya birewîn binivîse:* 3/4- ji çaran sisê , 5/6-ji şeşan pênc, 1/9-ji nehan yek , 4/7- ji heftan çar

- *Van jimaran bike nivîs û bûyerên wan dîrokan bide nasîn:*

1946: Hezar û nehsed û heftê û şeş ( komara Mehabad)
1925: Hezar û nehsed û bîst û pênc (şoreşa Şêx Se'îd)
1639: Hezar û şeşsed û sî û neh (peymana Qesra Şêrîn a pêrçekirina yêkê ji Kurdistanê re).
1514: Hezar û pêncsed û çardeh (cenga Çaldêranê- dagîrkirina Kurdistanê) ji hêla Osmaniyan de.
2004: Du hezar û çar (serhildana Kurdên Sûriyê).
1957: Hezar û nehsed û pêncî û heft (damezrandina partiya kurdî a yekê li Sûriyê)

***

## Wane: Lêker.. Pergalên lêkerê

- *Cihên vala bi nîşandekên kesan(**im, e, î, in**) dagire:*

Şiyar ji birayê xwe re got: Her sibehê ez li kata şeşan şiyar dibim . Lê tu dereng ji xew radibî , Xemgîn jî dereng radibe , Biracan wilo nabe! Gerek e win qîret bikin û zû şiyar bibin.

## Wane: Demên lêkerê

- *Di van hevokan de, berlêkerên ''bi, di'' û pirtika ''dê'' bi xêzikan nîşan bide, û dem û raweya lêkerê li ber binivîse:*

Lawo! Bixebite! Bixwîne! Fermanî.
Baranê giran lêdikir, lê dîsa me xwepêşandan kir. Dema borî.
Buhar e, gupik dibişkivin û gul vedibin. Dema niha. Xewna azadiyê wê bibe rastî, û hêviya me dê bi cih were. Dema wêbê.

***

## Wane: Lêkera ''bûn'' di dema niha de

*- Raweyên dema niha ya lêkera bûnê (me, ye, ne,yî, im, e, î, in) di cihên vala de binivîse:*

Ez Kurd im, zimanê min Kurdî ye, ez xwazgêncî me, em xwazgênciyê azadiyê ne , tu jî wilo yî , tu jî bindest î, ew jî bindest e, loma jî em tev azadîxwaz in.

***

## Wane: Darêja ''Hatin-Kirin'' (pasive voice)

*- Di vê deqê de darêja ''hatin kirin'' bi xêzekê dest nîşan bike.*

Hevalê me Dr. Şêrzad bi xinizî hat kuştin. Lê kuştar zû hatin naskirin û hatin girtin, birastî bawer ne dibû dê zû werin girtin. Darebesta pakrewan û bijîşkê zana ji hêla bi hezaran kes ve hat pêşwazîkirin, li ser dest û seran hat gerandin û li mezelê gundê Elendara hat veşartin. Gotin û gotarên nirxdar û bi şewat ji hêla heval, dost û xudiyên wî ve li ser gora wî hatin gotin.

***

## Wane: Xaleşanî

*- Xaleşaniyên lêhatî ( , - . - : - ! - ? ) li cihên vala dîne:*

Hevalê min ji min re got: Gava em sibehê ji xew şiyar dibin, em bi herkesekî ji malê re wiha dibêjin: Roj baş! Pişt re, em dest, çav û rûyê xwe dişon, cilên xwe yên pak li xwe dikin, porê xwe şe dikin û diçin karê xwe. Ma tu xwarina sibehê naxwî û diçî? Belê! Çawa! bê taşte, ta hişê mirovê jî naxebite, ma ne wilo ye?.

## Bêje û wate

- fêrkirin: hînkirin.
- Peyv: bêje, şor, gotin. kelîme- erebî.
- Şêwe: şekil, islûb-e.
- Rewş: Ĥal-e.
- Hevok: Cumle-e.
- Daristan: Cihê daran. Xabe-e.
- Rojname: Cerîde-e.

- Kovar: Mecele-e.
- Xaknîgarî: Cuxrafî.
- Pîroz: xudî rêzdarî. Mubarek-e.
- Temen: salên jiyanê. umir-e.
- Balkişandin: bala mirov dikşîne.
- Amadekirin: hazirkirin.
- Kurtkirin: ixtîsar-e.
- Herêm: warekî xaknîgarî.
- Netewe:  gel, milet.
- Tîpa dengdêr: Ĥerf sewtî-e.
- Tîpa dengdar: herif sekên-e.
- Sebaret: bi taybet, bixusûs-e.
- Awarte: rêzder. şaz, istîsna-e.
- Tîpa girêkok: du tîpên dengdêr digihîne hev.
- Jêhatî: jîr, zana.
- Wêne: sûret-e.
- Rahênan: hînker. Tadrîbat-e.
- Navîn, naverast: ortê. Weset, ewset-e.
- Kelepûr: tiştên kevin. Turas-e.
- Bersiv: cewab-e.
- Pirsgirêk: asteng, gelşe. Mişkîle-e.
- Pêkanîn: çêkirin, bi cih kirin.
- Kît: beşek ji bêjeyê.
- Armanc: amanc. Hedef-e.
- Hişmendî: baqilî. Hîkmet-e.
- Serbixwe: bi serê xwe. Misteqil-e.
- Sade: xwerû. Besît-e.
- Pêkhatî: çêkirî.
- Hevedidanî: Bêjeyek ji du bêjeyayn çêbûye.
- Pêşkît, pêrkît: kîtek bi pêş bêjeyan dikeve. Sewabêq-e.
- Paşkît, parkît: kîtek e bi paşiya bêjeyê dikeve. Lewaĥêq-e.
- Rojbûn: roja ji dayîkbûnê.
- Vejîn: ji nûve jiyankirin.
- Xeroş: şêrîn, rind.
- Rist: helbest.
- Bihêne: hîn bibe, nas bike.
- Payebilind: qedirbilind, bi rûmet.
- Rûmetgiran: cihê rêzdarî, rûmetê û ihtîramê-e.
- Nivişt: nivîsar.
- Jeng: tiştên ne baş ên biçûk.
- Navdêr: nav.
- Veqetandek: alavên nasandina navdêran.
- Tewandin: Îmele-e.
- Rengdêr: salixa tiştekî. Sîfe-e.
- Mijar: babet. Mewdû'-e.
- Navçe: binavkirina îdarî ya warekî. mentîqe-e.
- bi tevahî: bigiştî. Bi şekil 'am-e.
- Nêrza: tiştên nêr.
- Mêza: tiştên mê.

- Giyanewer: xudî giyan(roĥ).
- Berhem: nîtac-e.
- Rader: makder. Mesder-e.
- Serenav: navê tiştekî tenê î naskirî. Isim 'elem-e.
- Rêxistin: Munezeme, tenzîm-e.
- Razber: tiştên bi hiş tên naskirin. Me'newî-e.
- Mêjer: peyveke rêzmanî ye, hejmarê xuya dike.
- Taybet: nemaze. Xas, xisûsî-e.
- Yekejmar: jimara yek.
- Gelejmar: bêtirî yekî.
- Zayend: cinsê tişt dide zanîn.
- Têgeh: mefhûm, musteleĥ-e.
- Bîna: binavkirî, tiştek tê dîtin.
- Nebîna: nebinavkiriî, tiştek netê dîtin.
- Celeb: cure. نوع.
- Pêşbirk: qerez di listikan de. Sîbaq-e.
- Kortal: cihê kort.
- Peşkên baranê: dilopên baranê.
- Kendal: cihên zemînê yên bilind:
- Hêç: kesê ku tiştekî tênagihê.
- Pal : cihê bilind.
- Mûzexane: konexane. Metĥef.
- Xêz: xet-e.
- Berxortanî: temenê 12 ta 18 salî.
- Belengazî: perîşanî, bê mal û kar.
- Ol: ayîn. Dîn-e.
- Dîl: ji aliyê dijmin ve hatiye girtin.
- Şerpeze: lawaz, perçekirî, bêçare.
- Şop: rêç. Eser-e.
- Ronak: ron, ronahî. nûr-e.
- Wêje: tore. Edeb-e.
- Kesandin: veguhastina bêjeyan. Tesrîf-e.
- Gengazî: kanîn. Îmkan-e.
- Dawî: talî, paşî.
- Nimûne: mînak. Mîsal-e.
- Lêker: fi'il-e.
- Têper: gerguhêz, derhingêv. Mute'edî-e.
- Kirar: fa'êl-e.
- Bireser: mef'ûl bîhî-e.
- Zarav: lehce-e.
- Binyad: bingeh. Esas-e.
- Lêkolînvan: tiştan dikole. Bahês-e.
- Binezar: bin zarav. Teĥit lehce-e. لهجة محلية
- Pergal: taybetiyên tiştekî. Xesaês-e.
- Berz: bilind, naskirî.
- Cinav: cînav, pironav. Demîr-e.
- Kesîn: kesane. Şexsî-e.

- Peyvok: kesê ku dipeyive.
- Guhdar: kesê ku dibihîse.
- Nediyar: kesê ku gotin li ser e.
- Pîvane: rast. Qiyasî-e.
- Behane: hicet, zerî'e-e.
- Cinavên nîşankirinê: cinavên îşarkî.
- Qersene: pêwendî, têkelî. Elaqa-e.
- Amojgeh: cihê amadekirinê. Me'hed-e.
- Cinava pirsiyarî: cinava pirskirinê.
- Cinava girêkok: cinava pevegirêdanê.
- Lave: tika, rica. Du'a-e.
- Spehî: ciwan, rind, şêrîn.
- Berxudar: bi rêz, nirxbuha, pîrozî.
- Bêjeya dumil: ji du bêjeyan pêk tê.
- Beramberkirin: muqarene-e.
- Çalak: jîr. Neşît-e.
- Qelew: tawli, laşegiran.
- Hoker: zerf-e.
- Daçek: herf cer-e.
- Gihanek: pêwendî. 'etif-e.
- Rasteqîn: rast.
- Bangnîşan: bangewazî. Nîda-e.
- Gotox: kesê ku dibêje.
- Kirox: kesê ku tiştekî dike.
- Mirar: talî.
- Kirdar: ewê ku tiştekî dike.
- Amanc: armanc. Hedef-e.
- Jimarnav: jimara navdêr.
- Cure: celeb. New'i-e.
- Darijtin: çêkirina bêjeyekê, siyaxe-e.
- Hejmara rêzîn: payedariya li dû hev. Teselslî-e.
- Hejmara birewîn: Hejmara Kesrî-e.
- Dilêr: wêrek, ne tirsok.
- Dengvedan: vegera deng.
- Rawe: teşe, şêwe. Sîĝe-e.
- Kardayîn: spartin, delamet. Wezîfe-e.
- Lêkera têneper: negerguhêz, salt. Lezêm-e.
- Boriya borî: الماضي البسيط
- Boriya berdest: الماضي التام
- Nihoya pêşkerî: dema niha.
- Dema wêbê: dema paşerojê.
- Raweya fermanî: fermanê dide.
- Şermol: navê goristana bajarê Amûdê.
- Warguhêz: penaber.
- Darebest: tabût.
- Xaleşanî: nîşandekên di nava deqekê de.
- Matnîşank: nîşandeka matmayîn , fermankirin ê û 'ecêcbê-e.

- Pirsnîşank: ?
- Xelecot: du xal li ser hev.
- Kevan: qos-e.
- Deq: nivîsa pexşanî(nesrî).
- New: resen. Cîl-e.
- Belege: wesîqe-e.
- Lerz: liva bi lez a endamekî govde. Ricifandin-e.

# Naverok

**Babet** **Rûpel**

**= Elfebêya kurdî** 3

- Celadet Bedirxan hîmdarê Elfebeya Latînî ya Kurdî... Deq .. Husên Hebeş.

**= Bêje** 7

**- Kît.** 9

**- Bêje** 10

- Ziman û Hînkirina Ziman... Helbest.. Cegerxwîn. 13

**= Navdêr**

**- Bîna û nebîna di navdêran de** 14

14

**- Veqetandeka navdêrê** 15

- Seydayê CEGERXWÎN... Deq .. Osman Sebrî 18

**- Tewndina Navdêrê** 20

- Zaravên zimanê Kurdî... Şakir Xaspak.. Werger 23

**- Mêjer û zayenda navdêran** 25

- LEHÎ ... Deq .. Celadet Bedirxan 30

**= Cinav** 31

- Edebiyata welatî... Deq .. Kamîran Bedirxan. 38

**= Rengdêr** 40

- Ji Pend û şîretên Kurdî... Bavê Gulê. 43

**= Hoker** 44

- Diyarkirin ji bo xwendevanên helbesta min... Helbest .. Nîzar Qebbanî.. Weger. 46
**= Daçek** 49
**= Gihanek** 50
**= Bangnîşank** 52
- Ehemedê Xanî... Ji Mem û Zîn.. Helbest. 54
**= Jimarnav (hejmar)** 55
- Kîtine bijarte ji wêjeya Daxistanî... Deq .. Resûl Hemzetof.. Werger 57
**= Lêker** 59
**Pergalên lêkerê** 61
**Demên lêkerê** 63
- Ehmedê Xanî... Ji Mem û Zîn.. Helbest 67
**Lêkera ''bûn'' di dema niha de** 68
- Şîna ser şagirtên Amûdê... Helbest.. Seydayê Tîrêj. 70
**- Darêja ''Hatin-Kirin''** 71
**- Reweya neyînî ya lêkeran** 72
- Serhildanên Kurdan (1800-2000)... Deq.. Mihemed Ebdo Elî. 74
**= Xaleşan** 76
- Kokûbinyata gelê Kurd... Deq: Mihemed Ebdo Elî. 79
**= Hevok** 81
- Kurdên Kevnesovyetê... Deq.. Firat Cewerî. 87
- Bersivên pirsên waneyan 89
- Bêje û wat 95

=====================

**Di malpera Yek-Dem, meha Cotmehê 2024.Z-2636.K de, hate weşandin**

www.yek-dem.net

info@yek-dem.net

